



BAKİ BEYΝƏLXALQ  
MULTIKULTURALİZM MƏRKƏZİ  
BAKU INTERNATIONAL MULTICULTURALISM CENTRE

# Ahmedê Hepo

# XWEZİLA...

Hörmətli könüllü  
doktora müraciətindən  
ticidiz biz rədiyəs.  
Səmimi üzəndən Azərbaycan  
Jurnalistlər Birliyinin idarəet  
Şəhərədə Hərəkətdən  
Baxı  
21.09.2023.



Ahmedê Hepo

# Xwezila...

*Bi zimanê Kurdî û Azerbaycanî  
povêst û serhatî*

Bakû 2021

**Bakı Beynəlxalq Multikulturalizm Mərkəzi  
Navenda Mültikültüralizma Navnetewîye Bakûyê**

*Serwêrê pêşnûmê:*

**Kamal Abdullayêv**

*Sedré Şewira starkariyê yê Navenda  
Mültikültüralizma Navnetewîye Bakûyê,  
réktorê Univêrsitêta Azerbaycanêye Zimana,  
Nivîskaré gel, akadêmîk*

*Bersivdarê pêşnûmê:*

**Revan Hesenov**

*Dirêktorê qedenkar yê Navenda Mültikültüralizma  
Navnetewîye Bakûyê*

*Rêdaktor:*

**Xalîdê Evdilbarî**

*Korêktor û rêzkara*

*tîpén kompûtêrê:* **Şehla Axamîr**

Qewmandinên povêstê yênu ku jiyanê da hev alîyane, yênu ku wede wana bi zimanekî bedewî rûpêl, rûpêl dide vekirinê, dide zelalkirinê. Ew buyerên salên Serê salên 1941-1945-da derketine holê, salên dirêj têne domandinê. Mêrxasên povêstê ji malbeteke kurdanin. Bona rojênu wane dijwar û serfinîyazra bibî nas, ya qenc ewe, povêstê bi sebir, şîrîn-şîrîn bixwîne. Pirtûkê da çend serhatî yênu bi zimanê azerbaycanî jî cî girtine.

Yazıcı Ahmedê Heponun Kurd və Azərbaycan dillərində yazdığı povest və hekayelerdə təsvir olunan hadisələr İkinci Dünya müharibəsi illərində başlayır və dövrümüzədək davam edir. Əsərin qəhrəmanları sadə və zəhmətkeş bir kurd ailəsinə mənsubdurlar. Həmin qəhrəmanların qəmli-kədərli, eləcə də sevincli günləri ilə tanış olmaq istəyirsinizsə əsəri diqqətlə, sevə-sevə oxumağa çalışın.

**Ahmedê Hepo. XWEZILA... Bi zimanê Kurdi û Azerbaycanî povêst û serhatî.** – Bakı, Mütərcim, 2021. 112 səh.

ISBN 978-9952-28-579-6

© Bakı Beynəlxalq Multikulturalizm Mərkəzi, 2021

## Wêje jî pira dostane

Nivîskar, folklorzan, lêkolînvan û werger Ahmedê Hepo sala 1934-a li gundê Şiranê (naha ew gund tune), nehîya Qemerîyê, Rêspûblîka Ermenîstanê hatîye dumê.

Eva dewra rejîma Stalîn bû. Dema Ahmedê tifal 3 salî bû, malbeta wana tevî bi hezaran malbetên kurdên muselman, ji Ermenîstanê hate nefikirinê. Malbetên kurdayê nefikirî, li rêspûblîkayê Asîya Navîn û Qazaxistanê hatine hêwrandinê. Lê malbeta bavê nivîskarê paşdemîyê – Hepoyê Bedo tevî çend hezar malbetên kurdan tînin derxine rêspûblîka Qırqızistanê, marza Celalabatê, avana Kok-Yangakê.

Sala 1947-an dewleta Sovêtê bi fermî destûrê dide, wekî yên nefikirî, kî dixweze dikare vegere cîyên xweye berê. Payîza wê salê bi sedan malbetên kurdanra tevayî malbeta Hepoyê Bedo jî berê xwe didine Ermenîstanê. Lê gava hukumeta Ermenîstanê pê dihese, ku kurd careke mayîn dixwezin bêne cî-warêن xwe, ewana ber Moskva sor pirsê bilind dikan, ku ji welatê dereke ermenîyên “zêrandî” vegerîne Ermenîstanê, cîyê rêspûblîkê tengê. Bona vê menîyê jî, êşalon-rêzmalên kurdan gihîştinê axa Azerbaycanê, nehîya Yêvlaxê, bi destî Moskvayê, hukumeta cî nahêle, kurdên nefikirî herne Ermenîstanê. Wan mal-malbetên kurdan di nava nehîyen Yêvlaxê, Xanlarê, Qasim-Îsmayılovê û cî-warên mayîn “cî dikan”.

Ahmedê Hepo li vira, li avan-sovxoza “28 Aprêlê” dibistana navîn-dersxana 10 xelaz dike. Cîye, wekî salêن

xwendinêra girêdayî gotineke Ahmedê Hepo, ya bi dilêş bigihînine xwendevana. Ew dibêje:

“Gotî bê zanînê salên nefikirinê pêşiyê malbeta me avana rûsa da dijî. 7 salîyê da min îdî rûsî zanîbû û dersxana yekê bi rûsî xwend.

Wedê amede dibûm herme dersxana duda, bin destavan birîyareke hukumeteye kotî derket, wekî du malbetên qewm-pismamên nêzik destûr tune gundekî da, avanekê da bijî. Em û malbeta apê minî-Eloyê Bedo avanekêda dijîyan. Malbeta me anîne gundekî qirqizan. Du sala hînî zimanê qirqizî bûm û dersxana yekê bi qirqizî xwend. Wedê ezê bi qirqizî biçûyama dersxana duda, dîsa koçe-koç kete nava kurdan. Ev sala 1947-a bû. Malbeta me hat li Azerbaycanê hêwirî.

Du sal derbaz bûn, ez hînî zimanê azerbaycanî bûm û cara sisîyan sala 1949-a çûme dersxana yekê.

Pak bû ez zarekî jar û bejinêda kin bûm, zarêñ heft salî hew zanîbûn, ez jî hevalê wanîm.

O, neyarêñ Kurdan, agir, birûsk mala we kebe, ez jî devo bêñzîn hildim bême hewarîya we! Û bêjim:

– Hela binihêrin ji destê zulmê lawê-têgihîştiyê 15 salî, tevî zarêñ 7 salî, “diçe dersxana yekê!”

Bona xwendina bilind bisfîne, Ahmedê Hepo sala 1959-a diçe Rewanê (Îrevanê), dikeve zavodê û weke salekê paletîyê dike.

Ahmedê Hepo navbera salên 1960-64-a li Rewanê Însitûta Pêdagojîyê xilaz dike. Nava salên xwendinêda gotar, serpêhatîyên wî, wekokên zargotinîye wî beravkirî rojnameya “Rya teze”-da ronahî dibînin. Hê gava ew xwendevan bû, berevoka serpêhatîyên wî ya bi navê “Adar” tê weşandin.

Ew pirtûk wira navê nivîskarîyê tîne.

Piştî kutakirina înstîtûtê Ahmedê Hepo rêdaksîya rojnameya "Rya teze"-da kar dike. Li ser efrandarîya wî da bandora salên karkirina rêdaksîyê pirr û pirr bûye.

Nîvîskar sala 1970 ji Rewanê bar dike û bi malbeta xweva tê Bakûyê. Ji wê salê, hetanî sala 1998-a li Îdara sereke ya çapamenîyêda parastina sira dewletê (Glavlît) da, pêşîyê çawa sênzor-rêdaktor, paşê serwêrê parê kar dike.

Destpêka sala 1990-î destûr dan, wekî li Azerbaycanê da bi zimanê gelên hindikjimar pirtûk, rojname bêne weşandinê.

Di wî alîda Ahmedê Hepo pirr-pirr diçerçire. Romana wîye yekemîn "Bawerî" hema sala 1990-î ji alîyê weşenîka "Gençlik"êda, li Bakûyê tê weşandinê.

Ahmedê Hepo şev-rojanêن xwe dike yek û pirtûkên mîna romana "Bawerî"yê, romana "Birîn"ê, berevoka serpêhatîya ya bi navê "Hêşirê xwînê", "Emir gulvedide" ji zargotina gel – "Karîbarêن gelê kurd", romana "Rêwîyêن bê mal", bîranînê "Xemildarêن jîyanê" û yên mayîn dînivîse, dieffîne.

Her pirtûkeke nîvîskarê hêle di nava wêjeya gelê kurdda, di alîyê rastesereyêda, cîkî berbi çav digire. Mijarêن efrandarîya wî erf-edetê gelra, daxweza iro û ya sibêye geşra, hatine hûnandinê.

Azerbaycanê serxwebûn destanînê şûnda, bi kar – zehmetê Ahmedê Hepo, tevî çend ronahîbîrêن kurd, li Azerbaycanê Navenda Çanda Kurd "Ronahî" tê damirazandinê û ewî dijbêrîn çawa serokê vê navendêyî yekemîn.

Ji sala 1992-a rojnameya "Dengê kurd" tê weşandin.

Ahmedê Hepo dibe rêdaktorê wêyî yekemîn û di nava wedekî kinda destâ rojnamevana, rewşenbîran, helbestvan û nîvîskaran dora xwe diçivîne.

Sala 1993-a bersîveke bi xêrê nava Kurdêن Azerbaycanê da bela dibe. Tê birîyar kirinê, wekî Şîrketa Têlêradîyoa

Rêspûblîka Azerbaycanê bi radioya “Araz”-ê heftê du cara bernama bi zimanê Kurdî bê dayînê û Ahmedê Hepo kivş dikan, çawa rêdaktorê wê.

Gotî bi şekîrdarî bînîne serzaran, wekî kar-xebata Ahmedê Hepo ji alîyê hukumeta Azerbaycanêda bilind hafîye hêjandinê. Ew Endamê Yekîtîya Nivîskarên Azerbaycanê û Yekîtîya Rojnamevanaye. Nivîskar û karkarê civakîyê Ahmedê Hepo bi mîdala – “Tereqqî”yêva hafîye rewakirinê. Bi serencama Prêzîdîntê Rêspûblîka Azerbaycanê Îlham Elîyêv avayî dane wî.

Giringe bêjin nava efrandarîya Ahmedê Hepo da wergerandin jî cîkî berbiçav digire. Ewî gellek efrandinê nivîskarên Azerbaycanê, yên mîna Mêhdî Husêyn, Enver Memmedxanli, Mîrza İbrahîmov, Gulhusêyn Husêynoxlû, Sohrab Tahîr û yên mayîn wergerandîye bi zimanê kurdî. Ev jî ronahîyê davêje ser gelê bira! Bila neyê bîrkirinê, wekî wêjî jî pira dostîya gelana.

Çend pirtûkêن Ahmedê Hepo li Hewlêrê û Stenbolê ro-nahî dîtine.

Povesta “Xwezila” nexsekî nûhe. Di nava wî nexşê bedewnivîsarêda daxweza nivîskarê ridansipî, ew edlayî-aştî, mirovhîzi, yek jî ewe, wekî bila şer bêne hildanê, xwîna mirovên seqirtî cîyê sekinî neyê rêtinê û mirov bi xwe bibe xwedanê çarenûsa xwe!

**Barîyê Bala,**  
*helbestva*

# Xwezila...

*Aşitî û şer dijî hevin, Aşitî ji destê şêr  
digirî, şer ji destê aşitîyê.*

*Ahmedê Hepo*

cara  
livş

Ah-  
îtiye  
nê û  
Ah-  
Bi  
îvîev

rge-  
tnên  
nver  
xclû,  
Ev  
vekî  
ro-

be-  
aştî,  
mi-  
bibe

ala,  
stva

## Xwendevanê delal!

Naha, wedê ezî hevtê salîme dixwezim xwestina Karî, vesîyetê wî erdê nehêlim, bîranîna rojên derbas bûyî binivîsim:

Dema dest bi Şerê Dunyayêyî Duyemîn bûnê ez Müsa 9-10 salî bûm. Gundê meda mîr nemabûn. Bavê min jî biribûne şêr. Em 2 zarêr kurîn stuyê dîya xweda mabûn.

Tî bûn, birçî bûn bû. Lê gundê me bi xêr-bereket bû. Gundê mera digotin-gundê "Serdeştzozan". Ji ber ku, ew him serdeşt, him serzozan bû. Ew ji pêşa deşt-aranê destpêdibû, dihat digihîste quntara çiyê-zozanê. Malavayî-malbetêr wê 300-dî zêdetir bûn.

Min got, gundê me bi xêr-bereket bû, erê, sed car erê, ew dewlemend bû. Alîkî dewlemendîya wê bi destî binelîyên wêda, ji kevneşopîya kal-bavan dihat, alîyê din da xwezayê qe tiştek ji barê xwe bona gundê me paşa nehêwişand bû. Ji xêrberê paşîl-pêşîr-mêzera xwe ci hebû ser gundê me da reşand bû.

Erê keko, gundê me bi du war bû. Li warê jêrîn-alîyê aranê zevîyên gênim, cêhe, bona heywin ket dihate reşandin. Bostanê wê da zebeş, kindor, xîyar, pomîdor, tivir, silq, kelem, fîringîyên usa dihatine gîhîstînê bi navnav dihatine serzaran. Li jorê-alîyê zozanê tîrîyê reş, sipî zêde bi zêde bûn, darêr guzan, sêvan, hurmîyan, bindeqan, alûcan, tûtan û yên mayîn. Fêkîyê tem-lem ewqas bûn, ne ku téra gundê me dikir, ji der-doran jî dihatin, jî wî barî, bar-bar dibirin. Lê wekî navê pincarêr fêza gund, yên daristanêda heyî bikişînim, ew ne yekin, ne dehin: Elegez, tirşo, mendik, sipink, sûs, ket, pûng, cetirî û gellek-

gellekên mayîn, yên ku, cuda zivistanê dibûne dû-dermanê tendurustîya mirovan. Lê pincarêن bi şitil, bi tov reşandî, çiqas bi çiqasbûn, ewana, tu dema ji ser destexana kêm nebibûn.

Min derbarê ber-barên gundê me da wera badilhewa qal nekir. Wan tem-leman nedihîştin birçîbûn têkeve nava gundê me.

Li gundê me du stûn-kêranênil bilind, yek li jêrê, yek li jorê çekandibûn. Li jora her stûnekê amûr-cihazê pêlewş-radyoyê danîbûn û binelîyêndu cara beravî dora wan stûnan dibûn û guh didane ser nûçeyêni şer.

Erê, gotî ewê jî bêjim, gunda malbetên usa tune bû, wekî şer derê mala wan nekuta bû. Bi sedan çav şev-roj li rîyan qerimîbûn, guh ser deng-hesabûn, her tenê car-caran te dibihîst ji filankesê name hatîye. Çawa dibêñ, ew malbet ber pêyan diçû, gişkan dixwest, bizanbe, ka binê namêda çi hatîye nivîsarê, gelo di namêda navê kîjan binelîyê me hatîye kişandinê. Wedê dîya min dibihîst, mala filankesê name stendîye, ewê gazî min dikir û digot:

– Mûsa, dayîkê qurbana xwe bike, dibêñ mala filankesêra name hatîye, tu mîrê malêyî, here binihêrê, belkî ji bavê te tiştek heye! Zû here, zû ware!

Ez jî bi rev diçûme wê malê, bi rev jî dihatim. Min bi dêmekî xitimî li rûyê dayîkê mîze dikir, ewê her tiştêderdixist û tu tiştek nedipirsî.

Ê, lo, lo! Namê wê demê jî te qey digot mirovek dinivîse, gişke mîna hevbûn: “Selam, ez sax û silametim, eskerênen me hero dujmin qır dike. Em bere faşîstan didin. Zûtirekê şerê xilazbe, ezê bêm”.

Lê carna, namên “reş” jî dihatin. Wanda kurt dihate nivîsarê - “filankes bona welat bi mîrxaşî hatîye kuştinê.” Şîn-girî, hewar-gazî ji wê malbetê nedihate birînê, gund bi gundîftî dicû, dihate wê malê.

Ew îdî du-sê salbûn şer destpê bibû. Rojekê li gundê me bû hewar-heyî, gazî-bezî, wekî alman hatine gund! Hinekan digotin, ew hatine van deran bigirin, hinekan dihanî serzaran ew pêşta hatine li navberîyan binihêrin, mîzezin, xweşa wan bê, wê herin jorêra bêjin, paşê bi her timî bêñ. Hinekan jî hevran dikirne pite-pit:

– Ewana xerbend ketine, hukumetê ew anîne derxistine van cî-waran, wekî bidine xebatê.

Hey way, herekê tiştek digot! Kê çi digot bila bigota, binelîyêñ gund ketibûne nava tirsê, xofê, hese-hesê! Dayîkan hê roda zarokêñ xwe dikirne mal-avayan, derî, şibak-pencere serda dadidan.

Hêdî-hêdî, roj bi roj hate eyan kirinê, rastî jî ew mîren alman ji alîyê leşkerêñ “meda”, ji alîyê leşkerêñ Sovêtête “mîrxaşda” xerbend ketine.

Fêza mala me avayîkî bi pergalî duta hebû. Qal dikirin, wekî ew avayî berî hatina Sovêtê, ya begekî bûye. Bolşêvîkan beg kuştibû, ji malbeta beg jî hinek revîbûn, hinek kes miribûn, wergehê beg bê xweyî mabû. Digotin, çend salan berê ew kiribûne cîyê kewara zadê kolxozê. Lê paşê ew avayê pergal bi çend miftan tê mor kirinê û lema îro xopan-xopan dihate kivşê. Naha mifta dêrî hatibû ve-kirinê, avayî hatibû paqîşkirinê, ew serhevda anîbûn û “mêvanêñ” ji dûr hatî li wir cî-war kiribûn.

Rêya almana derê mala mera derbaz dibû, rêke mayîn tune bû. Rojekê ez û dîya xwe derê malê sekinî bûn, nişkêva dayîkê destê min qayîm-qayîm girt, min rûyê wê nihêrînê, ewê eşeretî, şanî da ez li rêtê binihêrim. Min nihêrî ji wan almana yekî bêjinbilind wêda tê. Ew hat derê mala mera derbas bûnê, li me nihêrî, vebîşirî, destê xwe minra bakir. Ew êpêcekî ji derê me dûrketinê, dîya min got:

– Ewî xerîbe. Kulê tu mala xerîbîyê, bê welatîyê bikebî. Mirovê xerîb him xizane, him belengaze, him jî mîna teyrê per-baskê şikestî, mîna dara bê ave cilmişîye.

Ji wê demêda, min tê derxist, tirsa wan ji dilê min derket, helîya çû. Ji wê rojê da hewaseke mayîn tijî nava ruhê min bû. Ewê hewasê ez ber bi avayê wan dev didam, dikişandim.

Çend hevtê hatin derbas bûn. Ez û birê minî biçük tev diçûne dibistanê. Dibistan fêza avayê wan bû. Em zû-zû dûrva rastî wan dihatin, wana destê xwe mera ba dikirin, vedibişirîn.

Ev kirinên wan hewasa mine ber bi wana daha jî zêde kir. Berêvarekê min gote dîya xwe:

– Ezê iro êvarê herim ser rêya wana bisekim.

– Here lawo, ewana ne meriv xwirin.

Ez hey diketime hundur, hey derdiketime derva, min qe bawer nedikir iro ro here ava.

Dem hat gihîşt. Ez dudilî bibûm. Min him dixwest herim, him na. Çûm. Min xwest ji alîyê mala me, derbasî alîyê din bim, nîvê beraya rêda çok li min qerimîn, hema nava rêda mam. Min nihêrî ji wan kesan sê mirov wêda tê. Yek yê bêjbilind bû. Ewana gihîştinê himberî min

sekinîn. Her sêk jî dêm xweş bûn. Yê bêjinbilind nêzîkî min bû, destê xwe dirêjî min kir, min destê wîyî qerçimek girt, nizam ewî ci got, min femnekir. Paşê bi destê xwe eşeretî da, wekî em herin, avayê ku, ew têda diman da kivşê. Ewî destê min girt, pey xwe kişand. Min derz kir, ew dixweze bêje, were em herine cî- avayê ku, em têda dimînin. Ewana ketine pêşiyê, min da pey wan. Em gihîştine hewşa avayî. Hewşeke mezin bû. Usa paqîş bû, qırşekî zêde ber çavan neket.

Dûrva ev avayî çawa yekî duta dihate kivşê, lê tu nebê ew sê ta bûye. Jêrzemîna wî avayî bi xwe weke takî bû û ew ji kevirnên usaye gire-mezine meht kirîva hatibû jenandin mirovan hey dixwest li wana mêzeke.

Bona derkebî tayê duda li erdê penkirî, bi xişir-kevirên reng bi rengîva, yên weke kefa destê mirovan, te tirê sinîke gilover hinartine û anîne li erdîva perçîn kirine, li ser wê pêlekanên bin hesin, ser bi texteyê rendekirîye weke hev, çêkirine. Almanê bêjinbilind destê min girt ser wan pêlekanara em derketîne tayê duda. Li wir, ewî bi destê xwe şanî da, wekî werê em derêne tayê sisîya. Ew kete pêşiyê, min da pey wî.

Ji wir dîdema gundê me pêda-pêda dihate kivşê. Her ku, ez mezin dibûm, xwestinekê dilê minda bi hizkirin, bi hestê qenc xwera hêlûna hevtê hevt rengî dihûna. Ew jî ew bû, bême avayê beg, derême tayê sisîya û ji şuŞebenda bi eceb çêkirî, li gund, nexşen xwezayêye dora wê hevgirtî mîzegin. Ewî ez li oda gerandum. Sê odayê mezin bûn, him jî hey tiştek ji min dipirsî, min femnedikir, ew ci dixweze bêje. Paşê dîsa destê min girt, ez daxistime tayê duda.

Li vir jî ewî dîsa tiştek ji min pirsî û destê xwe danî ser sîngê xwe, gilik serhev-serhev di wekiland, nişkêva hate hişê min, ew navê xwe dibêje-Karî, dixweze navê min pirseke. Min mîna tiştekî şabûnê got:

– Mûsa, Mûsa!

Ew kenîya, destên xwe hevxistin, bi dengekî bilind-bilind anî serzara:

– Mûsa, Mûsa!

Min jî navê wî wekîland. Li tayê duda min tê derxist ewana odêñ tayê duda radibin-rûdinêñ.

Li wir ewî hevalên xwera ci digot min derz nekir, her ew yek femkir navê min wanra dazanînê, wana hevra-hevra navê min kişandin, paşê her yeke destê xwe didane ser sîngê xwe û navê xwe digotin:

– Dîtmâr

– Krîstof

\*\*\*

Îdî min xwera kiribû edet her êvar diçûme “mala wan”. Rojekê dîya min nanekî tendûrê da min, wekî wanra bibim. Min ew nan bîr. Wana bi ecêb hev nihêrîn, virda, wêda axivîn, yekî rabû kerek anî, ew nan danî ser pêşxwînê, weke hev jêkir, kire çar pirtîya. Ji textên 2-3-ê buhustan ber, weke dirêja mêtir, mêtirnîvek, binva pê lêdayî, du rûniştok çêkiribûn, ew anîn danîne ber pêşxwînê û rûniştin. Ez ser pîyan çik sekînî bûm, yek ji wana rabû ez dame rûniştanê, wî çû qazikek anî, danî ber me. Sê tas anî, xwerekê qazikêda bi kevçîya parevekire ser sê para, parek qazîkêda hîst. Destpêkirin xwerek bi nanê tendûre

xwerin. Ez jî dame xwerinê. Xweşa wan gellekî bi nanê tendûrê hat. Xwerekên wan jî bi tem-lem bû.

Ez dereng hatime mal. Min her çi dîtibû dîya xwera qalkir, ewa dêmoxweş bû. Wê şevê ji şabûna xew nedikete çavên min. Berbangê zû rabûm, min dersên xwe wekiland, şerbikek şîrê germ bi nin xwer, çûme dibistanê.

Ew meha duda bû ez diçûm-dihatime bal almana. Ez hinî hinek gilî-gotinê wan bibû. Rabûn-rûniştandinê wan jî bi hewaskar bûn.

Rojeke usa bû ez û dîrêktor tev gihiştine ber avayê dibistanê. Ewî bi tinaz got:

– Peh, çi kurekî êginî! Pey min were oda mine karkirinê.

Ez pey wî çûm. Ew kete oda karkirinê, ez derva sekinîm. Du-sê deqîqe derbas bûn, ew derkete ber dêrî û hinekî birik got:

– Were hundur!

Ne ew rûnişt, ne ez, hema ser pê dîrêktor destpê kir:

– Tu zarî, tu femnakî, ezê te bidime serwext kirinê!

Te dûrva dîrêktorê dibistanê mîze bikira, teyê xwe-xwera bi gota: “Ew dep-depî bûye”.

Ew berbi min hat, destê xwe bilind kir, wekî min xe, lê zefta xwe anî, paşa vekişîya, virda, wêda çû, hat, bi hêrs got:

– Kê te kûçikîra gotîye, tu herî bal wan almanan! Ewana neyarê welatê me-Sovêtene. Bavê te li şere. Ew-alman hatine ser me, ser bavê te, bavê min, me hemûya bukujin, tu ji diçî avê destê wan dikî. Tuyê toreya şagirtan bidî xirab kirinê. Wekî ez bibînim, yanê bibihîzim tu

careke din çûyî bal wana, ezê te ji dibistanê derxim, bere te bidim, wê şûnda heta-hetaye tuyê rûyê dibistanê nebînî. De, naha biceme here!

Ez ji bal wî derketim, bavê min hate ber çavê min, gilî-gotinên dîrêktor dilê min qul-qulî dikir. Min xwe da kuncekî dibistanê, têr-têr girîyam.

Min qe nizanibû wê rojê ders çawa derbas bûn, dersdaran ci digotin, ci dipirsîn. Pey dersanra bi lez, bi kel-bîn hatime mal. Min derî vekirinê, ketinê hundur, dît wekî mîlîsê deverê, dîya min û birê min pêşberî hev rûniştinê. Dîya min kere-ker hêşir dîbarand, mîlîs bi gefgur diaxivî. Mîlîs ez dîtinê ker bû, dîya min hêşirê berê çavêن xwe paqîskir.

Mîlîs êpêcekî bi nêrînên tûj ji sero-pêya li min nihêrî û xwest minra ci bêje, ci nebêje, dîya min berê xwe da wî:

– Hîvî dikim, – got, – tu tiştekî nebêje, ezê bi xwe ci heye wîra bêjim.

Mîlîs kumê ber xwe hilda, da serê xwe, rabû çû, ber dêrî sekînî û bi dengekî nexweş gote dîya min:

– Meta Seyrê, usa bikin ez careke din neyême vê malê! Usa bikin bila şevekê derê we neyê kutanê!

Mîlîs ji mala me derketinê, em tiştekê nehesîyan. Ew jî ew bû, hema wê gavê maşinek tê mîlîsê deverê dibe navenda nehîyê, mîlîsê nehîyeyî sereke ewî dipejirîne nava wanda ev axavtin tê derbazkirinê:

– Te çikir? – mîlîsê sereke dipirse.  
– Min serhev, serhev teme da dîya wî, wekî ewa careke din nehêle ew newxêr here bal almana.

– Ew hindike! Wekî careke din ew here, dest bavêje  
reyên din.

- Bavê wî şerê da efatî kirîye.
- Ew pirseke dine, ev tiştekî mayîne.
- Ew zare.
- Lê qelefîyêñ mezin dike.
- Zarê çawa bigirim têkme qulikê?
- Çima reyên mayîn tune?

Herdu da çavêñ hev mîzekiribû, yek sipîçolkî bibû,  
yek xwîn tijî çavan bibû, soro-moro bibû.

Çend salan şûnda em bi van gotina hesîyan.

Min xwest axavtina dîrêktorê mektebê dîya xwera  
bêjim, lê... Dîya min hat ez hemêz kirim, hate rûyê min,  
çenteyê pirtûkan ji destê min girt, bir danî cîyê cî û hat  
destê min girt, ez dane rûniştandinê, çû ji birinceşîra petî  
tasek, yek jî hinek nan anî, da ber min û got:

- Lawo, nanê xwe bixwe, paşe ezê tera her tişti bêjim.
- Dayê can – min got, – medê min tune, bêje, paşê  
ezê bixum.

Ewa ber min gerîya, min çend kevçî xurek xwer.

Ewê tiştek ne got, hat kêleka xwe kuta kêleka min,  
destekîva porê min hevxist, destekîva tîliyêñ min kire nava  
kefa destê xwe û bi dengekî xeriqî got:

– Lawo, dê qurban, mîlîs hatîbû, digot, bila careke din  
Mûsa neçe bal wan almana. Yanê na...

Ewê gîliyêñ xwe serhevda ne anî, bû kûre-kûra wê  
girîya. Me herdu kuran destê xwe ustîyê dêra bir, ewa  
yeko-yeko hate rûyê me. Ez jî hatime rûyê wê û got:

vêje – Dayê, bavo çûnê şêr, bal te gote min, Mûsa lawo, tu kurê malêyî mezinî, tu wexta ji gura dayîka xwe derneyê. Min jî gote wî:

ibû, – Bila, bavo! Dayê, tu çawa bêjî, ezê usa jî gura te bikim.

vera Hema vê gavê dengek li me tesele bû. Deng hate wekilandinê:

nin, – Seyrê, Seyrê! Derê derva!

hat Dîya min berbi wê revî, destê xwe dirêjî wê kir û bû xirexira wê:

petî – Nama Şemo...

jim. Gilîyên wê nivîcî ma, ew jorda hate erdê. Berî me Namebirê xwe gîhande wê, serê wê bi herdu destava hilbirî, danî ser çoka xwe û ser meda qirîya:

paşê – Şerbike av bînin!

nin, Min revî, şerbîk tijî av kir û anî da wê. Ewê av tijî  
ava gepa xwe kir û pîvkire rûyê dayîka me. Dayîkê mîna zaran  
din kire îske-îsk, çavêن xwe vekir û got:

wê – Xwîskê, ez qûrban, ka name?

ewa Namebirê pişta wê rast kir, paşê dest avîte centê kîle-  
ka wêda darda kirî û name derxist dirêjî dîya min kir.

Ewê jî wê çirikê name dirêjî min kir û bi kelogirî got:

– Mûsa, ez bi gorî, namê veke, bixûne.

Min bi lezo-lezo name vekir. Destnivîsara bavo  
naskir. Ewî name bi herfê gir-gir nivîsî bû. Min dest bi  
xwendina namê kir:

*"Seyrê, selam! Ez tême çavêن zaran. Miqatî xwebin,  
ezê zûtirekê bêm.*

*Seyrê heyran, de bi xatirê we!"*

Wê rojê, wê êvarê, wê şevê şayê û şêr dere me kuta bû. Ew hev piçilikî bûn. Te tirê şaya nama bavê min, şerê dîrêktorê dibistanê, ya mîlîs, mal da hevra ketine hucetê. Lê şabûna nama bavê min hêdî-hêdî dilê meda germayî pêşta dianî.

\*\*\*

Sibetirê hatina nama bavê min li gund bû şar-war, hewar-gazî. Meriv mîna sêlafeke gur dikişyane mala me... Gişkan çavronahî didan, hinekan pirs, hinekan hîvî dikir, name bê xwendinê, çawa dibêن, dilê xwe bi wê rehet dikirin, dihişîn dicûn. Lê gellek jin ne çûbûn. Çend jina çay dikelandin, dem dikirin, çendan jî çay didane ber kesên rûniştî. Evê yekê hetanî êvara dereng kişand. Met-xatîyên min, ap-xalêن min, qewm-lêzimên din şev ji şevê derbas bibû, lê hê ji nêta wan tune bû rabin herin. Dîya min hey digirîya. Eva yeka qe xweşa meta min jî ne dihat. Ewa kêleka baltûza xwe rûniştibû. Ez jî piş wan. Ewa haj ji min tune bû, gote baltûzê:

– Lîlê, tu qey dibêjî Seyrê şa nîne Şemo tê. Roda digirî, ew hêşirên wê, ne hêşirê şabûnêne.

Baltûzê jî kire piçinî:

– Erê, ez jî ser avê ketime, hişbe, emê paşê biaxivin.

Wana nizanibû kula bavê min alîkî dilê wê quldike, ya min jî alîkî. Dayîk bona min ditirsîya. Lê neheq ewa

*bin,* ewqasî xwe dipertine, hundurê xwe dixwe. Ne min gîlî daye wê, ewa çawa bêje, ezê usa bikim.

Lê salê bêñ derbaz bin, ezê tijî emir bim, hê derzkin dîya min, çîma usa kirîye. Ewê rind zanîbûye, bona rasthatina mine tevî almana, wê demê, dikaribûn hêsa ez usa undakirama, qe heta-hetayê kesîkî nizanibûya ci hate serê min.

Ewê berî kaşê-kaşa sala min, gellek qewmandinên Sovêtîye pûç zanîbûye, bihîst bûye. Ezê yekê ji wana, ya ku, dîya min kere-ker, bi piçe-piç minra qalkiribû, ez jî qalkim...

Dersdarekî dersxana yekê spartinekê dide şagirtan. Ew dibê:

– Ezê meselekê wera çawa minak binivîsim, hûn jî li mal, çend meselên usa binivîsin.

“50 çêlekê kolxozi hebûne. Zivistanê 22 çêlek nexweş dikebin, mirar dibin, pênc çêlekan jî didizin. Çend çêlekê kolxozi dimînin?”

Sibetira wê, têñ wî dersdarî ji dibistanê derdixin, dibin. Qe heta roja îtroyîn jî, kesek nizane ew kuda birin”.

Tawanbarîya dersdar ew bûye, wekî çawa yanê çêlekên kolxozi nexweş ketine, mirar bûne. Ev yek rûmeta Sovêtê pêpes dike. Qe Sovêtêda kirînên usa naqewmin. Ev gotinên neyaranin.

Dayîka ku, bi dehan qilêrîyêñ Sovêtîye awaye pûç, vala bihîstibûn, zanîbûn, qe dikaribû bona wê pirsa ewledê xweye bi nêrînên wan salaye, ku jê bîna xwînê dihat, hêmîn rûnê, destêñ xwe ser hevra bibira.

Roja din dîsa meriv hatin, çûn. Mala me sê-çar rojan, ji mirovan xalî nebû. Nama bavê min ewqasî hatibû

xwendinê, ew belgê kaxezê sipî reş-sipî, gewir, waşîyayî dihate kivşê.

Pey hatina nama bavê minra her rojek weke hevtêkê, weke mehekê ser mera derbaz dibû. Dengek, hesek, şeqeşeqek hatinê bihîstinê, em çarçavî dibûn me rûye hev mîze dikir, dilê me dikire çirpe-çirp, gelo hatî kîye, çûyi kîye?

Rojekê tarîyê erd hingavtinê, dest-pê ji malên gund hatibûne kişandinê seyê me reya. Dîya min ji cîyên xwe rabû û bi dengekî ricav got:

– Se direyê merivan, Xwedê xérke ew kînin?

Ez rabûm herim dêrî vekim, dîya min nehîst, bi xwe rabû, çû, min jî da pey wê. Yêن hatî dîrêktorê dibistanê û mîlîsê deverê bû.

Dîya min her tenê gilîk got:

– Keremkin.

Dîya min da pêşîyê, wana da pey wê, hatine odameye mezin, rûniştin.

Pêşîyê dîrêktorê dibistanê, paş mîlîs bona namê çavronahî dane dîya min. Weşekê şûnda dîrêktor berê xwe da min:

– Sibê were dibistanê, ji dersa paşda nemîne.

– Erê, – dîya min got, – ewê sibê bê dibistanê, îro çend rojin, hatî-çûyi pirbûn.

– Xatîya Sêyrê, – mîlîs tevî axavtinê bû, – her tenê bila mirov bona şayê bêne mala mîriv. Tiştekî din nebe dilê xwe, em hatin çavronhîyê bidine we.

Dîya min razîbûna xwe da wana. Ewa rabû, wanra çayê bine, wana nehîst. Ewana hevra rabûn û gotin, wekî

îdî derenge, emê herin. Ewana çûn. Dîya min sipîçolkî bû  
û ber xweda nêta mîlîs wekiland:

“Her tenê bila mîrov bona şayê bêne mala mîriv” û  
berê xwe da min:

– Lawo, rabe razê, sibê wededa here dibistanê.

Paşê destên xwe qulozî hewê kir, ber Xwedê gerîya:

– Ya Xaliq, heqîyê nedî, neheqîyê!

Ewê xwest here oda din, min pêşa wê girt û pirşî:

– Dayê can, dayê, tu çîma ewqasî digirîyî, qe şâ nabî  
ne bavo tê.

Ewê ez qayîm-qayîm hemêz kirim, hate rûyên min  
got:

– Lo, ez qurbana bavê tebim jî, qurbana te bibim jî.  
Bila dilê te tifalîda tiştek nemîne, ezê ya dilê xwe tera  
bêjîm.

Ewê hêşirê berê çavêن xwe paqîşkir û dîsa axavtina  
xwe domand:

– Lawo, şer hê xilaz nebûye, bavê te dînivîse, zûtirekê  
emê hev bivînin, yeqîn ew yanê nexweş ketîye, yanê jî  
giran birindare, kî ku, ji şer zû vegeรîye gişke nivcanin.  
Gundê meda jî sê-çar kesê usa henin. Eva yek. Ya duda, tu  
dînihêrî dîrektoรê dibistanê, mîlîs ji me dest venakîşînin.  
Tu zarî, hê gellek tiştî nizanî, mezin bûnê, tê serwext bi,  
min dêranê çîma hey hêşir barandîye. De, rabe razê, îdî  
derange, sibê here dibistanê.

Wê şevê zû razam, zû jî rabûm û çûme dibistanê.  
Zaran hinekan bona nama bavê min ez pîrozkirîm, hinek jî  
min direvîn.

\*\*\*

Roj dibuhrîn, çavêن me li rê-dirban, dilê me tirpe, tirp bû, guhêن me li ser deng-hesan bû. Dîya min xwe xwera hey ev mesele-metelok digot û diwekiland:

“Roja kasib derd û xeme,  
Dîsa dibê: “Xwedê rehme”.

Birê minî biçûk, rojê çendî çend cara ji dayîkê dipirsî:

– Lê bavo çima nayê?

Evê pirsê jî bîna dîya min diçikand.

Ez jî gellekî ber xwe diketim. Qe min nikaribû malda rûnêm, hema ku dibû xişte-xişa tiştekî direvîme derva, dilê xwera derbas dikir, bavo hat. Him jî ne diçûme bal almana.

Ez ser tiştekî jî metel mabûm. Çawa dibên, gund gundîti hatine mala me, çûn, lê çima almanekî derê me venekir? Min ev pirs dilê xweda hildixist, dadixist. Lê kir, ne kir nikarbû taba xwe bînim, lema jî dayîkê pirsî:

– Dayê, çima ji van almana yek nehate çavronahîyê?

– Lawo, çawa tu nikarî herî bal wan, usa jî ew nikarin bêne mala me.

Him jî, tu hê ji bayê dunê tunenî? Ewqas çav li ser wan heye, usa teme dane wan, ew nikarin gavekê virda, wêda bavêjin! Mîlîs jî şev, roj ser bîna wan rûniştîye.

Belê, hingî nama bavo hatibû, dîya min qe sebir nedîkir derekê rûnê. Te tirê qestbende hey destê xwe nava malê digerand, şuxulê paqîşiyê dikir. Rojê pîkî diçû dar-

istanê, ji fêza gundê me pişti êzing dihanî. Lê îro ewê du pişti êzing anîbû. Vê êvarê min ji wê pirsi:

– Dayê çan, çima ewqasî xwe leylî dikî? Ne dibû, te îro pişte êzing bihanîya?

Dîya min destê min girt, ez anîm pêşberî xwe dame rûniştandinê û dest bi axavtineke hewaskar kir:

– Lawo, go du dost hebûne. Wana 50-60 salî hevra dostî, biratî kiribûne. Yek wefat dibe. Yê din wedekî dirêj naçe mala dostê xwe. Rojekê li sûkê ew rastî kurê dostê xwe tê û jê dipirse:

– Birazî, hingî dostê min dunya xwe guhastîye, hûn zarên wî, pêşta çûne, yanê paşa mane?

Xort dibê:

– Apo, bavê min wefatbûnê şûnda em gellekî pêşta çûne.

Dostê bavê wî dibê:

– Şukur! Ez şame!

Çendekî şûnda ew mîrik xwe-xwera dibê:

– “Ezê sibê rabim herme mala dostê xwe, rehma Xwedê li wî be, ew camêrekî êgin bû, serederî ji her tişti derdixist, wedê zindîbûye, wî çima nehîştiye zarên wî pêşta herin?”

Ew ji gundekî din bûye. Zivistan bûye, hespê xwe sîyar dibe, tê gundê dostê xwe, diçe derê mala wî peya dibe.

Wedê dikebe hundur, dinihêre zarên dostê wî gişk beravî dora bixêrîyê bûne, xwe ber germ dikan.

Zar çav dostê bavê xwe ketinê, ji ber bixêrîyê radibin, têne ber dêrî û kurê mezin dibê:

— Apo, tu sersera, serçavan hatî, ci qewimîye, vê sursermê ewqas rê hatî?

— Birazî, — dibê, — tiştek ne qewimîye? Wê rojê te got, wekî pey mirina bavora em êpêcekî pêşta çûne, min go herim her tişti bi çavêن xwe bibînim.

Xort serê xwe dike ber xwe û dibê:

— Apo, wedê bavo zindî bû, havînê, payîzê tîvdîra zivistanê dikir. Ewî ewqas êzgin beravî ser hev dikir, te di got, ew qelexa pesarıyane. Dibînî xanîyê me çiqasî mezine, bixêrî êpêcekî dûrî dêrîye. Me êzing tijî bixêrîyê dikir, ji destê germê em paşa dihatine hetanî ber dêrî. Pey rehmetîra em nikarin karê zivistanê bikin. Em bixêrîyê qırşik-mırşkavan vêdixin, ew jî germayê nade. Em gişk pêşta têن, ber bixêrîyê rûdinêن, wekî xwe germkin. A, pêşta çûyîna me eve.

— Paşê dayîkê av xwest, min rabû av danê, ewê dûmayîn da axavtina xwe:

— Kurê min, dest bi payîzê bûye. Em idî sobeyê vêdixin. Te hewnîhêrî sibê jî zivistanê dere me xitimand. Lê ez naxwezim, em mîna wana kesan pêşta herin, pêwîste zehmet bikişînim, yê zehmet dîtî birçî namîne. Evê şireta min tu demê bîrneke.

Min her gotineke dîya xwe femkir, rabim hatime destêن wê û çûme xanîyê din, wekî dersên xwe biweklînim. Min naha daha gellekî fikra xwe dida dersan. Xwe-xwera digot, bila qest menîya li min negirin.

Wê rojê, wedê navbirîna dersan hemû şagirtêن dersxanê li dora min çivîyan, herekê pirsek dida min:

— Bavê teyê kengê bê?

- sur- – Bavê te namêda nenîvîsîye menîya hatina wî çîye?  
 got, – Ne şer hê xilaznebûye?  
 go Hema vê gavê dîrêktorê dibistanê derî vekir, hate  
       hundur û bi hêrs got:  
       – Çareke din ez nebînim, wekî hûn awa beravî dora  
       Mûsa bûne. Bila ew dersên xwe bixûne.  
 zi- Şagirtekî bi şabûn got:  
 di- – Îro Mûsa ji dersa dîrokê “5” stendîye.  
 qasî Dîrêktorê dibistanê qe tiştek ne got, paşa vegevê, çû.  
 riyê Her çi dibû bila bibûya, rojêne me, şevêne me mîna salekê  
 Pey ser mera dihat derbas dibûn. Lê ewa îdî êpêce wede bû,  
 riyê nama bavê min hatibû, ji wî ne deng bû, ne hes. Payîz jî  
 gişk ketibû qamê xwe, rojan ba dihat, carna dûmanê ser gundê  
 A, me da digirt, şevan jî zû-zû baranê lêdikir.  
 ewê Şev ji şevê derbaz bibû. Dîsa ez dîya xwe pêşberî hev  
       rûniştibûn.  
       – Lawo, – ewê gote min, – derenge rabe palde.  
       Lê qe xewa min nedihat, dilê min destê min dabû.  
       – Dayê, sibê roja ledêye, ezê têr paldim.  
       – È, dîya min roj jî hev xistibûn.  
 reta Hema vê weşê seyê me kire ewte-ewt, elbêra jî dengê  
       xwe birî.  
 ime Dîya min ji cîyê rûniştî bi sivîk quloz bû û çavêne xwe  
 we- kuta dêrî, te qey digot, hinekan gazî wê kirîye û ewa  
 san. dixweze derkeve derva.  
 rtêne Seyê me dîsa kire ewte-ewt, dîsa kirt dengê xwe birî.  
 Dîya min bi dengekî xeriqî lêvêne xwe hilda, danî ser hev:  
       – Bavê te hat! Bal wî merîyê ne nas heye. Se direyê  
       wî.

Ewê berbi dêrî lezand, litimî, bi desteka dêrî xwe girt. Qameta xwe rast kir, derkete hewşê, berbi deriveze revî, min jî da pey wê. Ewê qe nepirsî, kî heye, kî tune û bi hêza milê xwe deriveze vekir. Vebûna derivezera dengek tesele bû:

- Seyrê, şirînê, eva ezim!
- Şemo, qûrbana denge tebim, – dîya min got, – û ji dil kire axinî!

Dê-bavê min dest ustîyê hevra birin. Te tirê ewana ciyê xweda qerimî bûn, nişkêva min kire qirinî:

- Bavo, bavo!

Min tarfîyêda qe nedît ew çawa hate rûyê min. Mirovê bavê minra hatî, dostê bavê min apê Cahangîr bû, ew navenda nehîyê dima. Avtoajo dixebeitî. Ewî got:

- Derva sare, him jî tarîye...
- Dîya min gîlîyê wî nivcî hişt kîlimî:
- Erê, erê! Cahangîrê bira, warê em derbazî hundur bin.

Ewâ kete pêşiyê, bavê min destê min girt û em hatine hundur. Wê qasê birê min ji xanîyê din derket, bavo ber bi wî çûnê, min dît ew dikule. Dîya min jî ev yek tê derxist û kete milê wî, ew ser depik da rûnişandinê, çû deste Barî girt anî bal wî. Bavo ew hemêz kir û kere-ker ser rûyê xweyî bi pirç, çilmisîda hêşir barand û mirçe-mirç, hate rûyê wî. Dîya min jî xwe şaş kiribû, nizanibû ci bike? Ewê çû çaynîk tijî av kir, anî danî ser sobayê, paşê êzing anî kire sobayê. Apê Cahangîr berê xwe da dîya min:

- Seyrê, xwîşkê, şukur vê rojêra, çavêne me tevayî ron be! Ji dest-pîya neçe, were rûnê, derange çend gilîyan

bêjîm, ezê herim, sibê karê minî ferz heye, de şuxulê hukumetêye...

Dîya min hat rex bavê min rûnişt. Apê Cahangîr rabû, berê xwe da dê-bavê min:

– Bila zûtirekê avek ser vî şerîda bê rêtinê, yên çûyî, sax-silamet vegerine malên xwe. Bila Xwedê careke mayîn destê we ji hev neke. Bila zûtirekê dengê top-tifing û firindên sewgirtî bêne birandinê!

Dê-bavê min çiqasî kirin-nekirin apê Cahangîr nema, çû. Ew çûnê dîya min pirsî:

– Şemo qurban, tu ku rastî birê Cahangîr hatî?

– Çend sehata berê, – ewî qalkir, – ez ji trênenê peya bûm. Hatime mala camêr. Ew û neferê malê şabûna ni-zanbûn ci bikin. Destexaneke têre-tijî vekirin, lê nan gewirîya min da ne diçû, min dilezand bême mal. Cahangîr rabû, ez kirme kabîna maşinê û berê wê da gund.

Apê Cahangîr çûne şûnda dîya min got:

– Şemo heyran, eva nêzîkî çar salane te nanê malê nexwerîye, rabim tera destexaneke malê vekim.

– Na, – bavo bersîva wê da, – min mala Cahangîr nan xwerîye. Paşê...

– Ez heyran, – dîya min pirsî, – ez korbim, lê çima tu dikulî?

– Tu rabe, avekê germke, teyştê bine pîyê xwe bişom, lê posîde nebe, şukurbûna xwe bîne.

Dîya min elbêra teyşt anî danî ber pîyê bavo, ava germ, sar hevxist, dest avît gorêñ wî derxe, ewî nehîst got:

– Hêdika,bihêle gora pîyê çepê ez bi xwe derxim.

Dîya mine çav bi hêşir, pîkî paşa vekişîya. Bavo hêdî-hêdî pêçika pîyê çepê vekir, gore derxist. Dîya min xar bû pîyê wî mîze kir û pêra-pêra dest avîte rûyêñ xwe, kire hilke-hilk. Bavo bi destekîva milê wê girt û bi hemdê xwe got:

– Şememokê, – cîwantîyê da min tera usa digot, – ne min pêşta tu serwaxt kirî, xwezilbûna xwe bîne. Bihêle hema vê gavê tera diloka xwe bêjim:

– Şememoka devê çeman,  
Şememoka dora kanîyan,  
Destê xwe bide deste min,  
Heyran bim rojê sê caran.

Dîya min helebez veپişirî.

Ez jî ser bavora sekinibû, me dît sê pêçiyê pîyê wîyî çepê tunenin. Me deng da dengê hev girîyan, hêşir barand. Bavo destekîva zenda dayîkê girt, destê din ustuyê me herdu birara bir, berê xweda me:

– Dewsa hûn şabin, şînê dikin. We şer nedîtiye, we şer bidîta, weyê naha dilan bigirta. Şêr da kî ket, ket, kî bû xurê top-tifingan, kesek vengere li wî mîze nake, ser meyтар derbaz dibin û pêşta diçin, carna jî paşa vedigerin. Qewmandinêñ ku, li meydana şêr diqewimin, himberî wê, tunebûna sê peçiyêñ min ew mizginîye. Megirin, kêleka min rûnêñ ez hinekî derbarê rojêñ derbazbûyîda wera bêjim:

– Erê, lo ez bi gorî, – dîya min got, – dilê min tê biteqe, ca bêje tu li kêderê, çawa hatî birîndarkirinê?

bavo  
min  
twe,  
mdê  
  
- ne  
hêle  
  
wîyî  
and.  
me  
  
we  
î bû  
hey-  
erin.  
wê,  
leka  
vera  
  
n tê

Paşê dayîk alîyê wîyî çepê, em bira alîyê rastê rûniştin. Bavo pîyê xweyî birîndar kiribû teysha ava tînşkestî. Dayîkê rabû ew bi herdu destê xweva, bi fesal şûşt, bi pêşgirêva ziya kir. Bavo xwera derman anîbû, dayîkê ew derman da ser her sê pêcîyan, bi kitânê girêda.

Bavo serê xwe kire ber xwe û giran-giran dest bi axavtinê kir:

– Berdilên min, ezê nikarbim îşev derbarê hemû rojêñ xweye şerda wera qalkim, sehet ji sehetê derbaz bûye. Ewê bêjim, roja ku, ez ji vî gundê meyî hizkirî birne şer, mehekê şûnda ez anînme bajarê Lênîngradê, hetanî dema birîndarar bûnê, li parleşkerîya wî bajarî da xizmet kirîye. Sala ewlîn sur-serma-şexta wê, bona min mîna şer giran bû. Zû-zû nexweş diketim. Çavêñ dujmin timê li Lênîngradê bû. Neyar ew bajar kire nava dorgirtinê. Neh meha ew bajar hate dorpeç kirin. Destpêbûna adara îsalîn (1944) leşkerê me bi êrîşeke derbêñ giranva dujmin da revê, ez jî wê êrîşêda hatime birîndar kirinê. Şevekê nava meytada mam.

Dîya min bi herdu destava jûnîyêñ xwe kuta, kire ofinî, axinî! Bavo piçîkekî hêrs bû, gote wêya:

- Ne min got, şukurbûna xwe bîne!
- Seqirîyê hinekî mal hingavt, bavo ew teriband:
- Te tirê bîna nanê tendûrê hate min, nîn bîne.
- Erê, ez qurban, min nivro teyşte nanê tendûrê petîye.

Pey van giliyara ewa zû rabû çû maldizkê. Destexan anî ber bavo raxist, du nanê tendûrê, toreq, rûnê nivîşkî, tase avsîr anî danî ber wî û got:

- Keremke!

– Kerema te Xwedê be, – bavo bersîva wê da, – warêñ tev min nîn buxun, bila dilê min rehet be. Dîya min pêşberî wî rûnişt, çavkire me kuran, me jî hat kêleka xwe da kêleka wê û dest avîte destexanê.

Bavo şirîn-şirîn nan, toreq, rûn dixwer, him jî diaxivî:

– Ezê naha mizginîyê bidime we. Wî şerê giranda, bila bi pesin nîbe, min jî mîrxasîke hêle kir. Bona wê yekê ez bi mîdala “Bona parastina Lînîngradê”-va hatime rewakirinê.

Me hevra ew hemez kir, dayîkê enîya wî da ber ma-can, me biran dêmên bavo ser hev, ser hev ramûsa. Bavo bi destê xwe şanî da, wekî bese:

– Torbê min bidin mîdalê nîşanî we bikim.

Dayîkê ber xwe neda pirsî:

– Ez heyran; lê çîma te mîdal pêşîra xwe nexistîye?

– Ez tîrsîyam wêya rêda undakim.

Bavo mîdal ji torbe derxist, dayîkê wê lezê mîdal ji destê wî revand. Ewê şabûna ew da ser çavêñ xwe, dor hev çend fitil da xwe:

– Lo mîrxaso, – dayîkê mîdal dûrî bavo girt û got, – ezê mîdalê têkme avê, ava wê vexwim!

Min jî kire qirinî:

– Bavo, ezê sibê mîdalê bibime mektebê nîşanî şagirtan kim, bila dîrêktor jî bivîne, şermke!

Bavo bi hemdî xwe berbirî me bû:

– Çîma dîrêktor ci şasî kirîye?

Dîya min:

– Qet, tiştekî valaye. Ezê paşê tera bêjim.

Ewê him jî çavkire min. Min têderxist dayîk naxweze vê şevameye şayîda ser pirsa almanan veke. De, wekî us-anen bavo kêlimî:

– Mûsa, mîdalê nebe mektebê, tişte usa meke, paşê ezê tera bêjim çîma?

– Lîlê, were destexanê hilde! Ez jî, hûn jî westîyane. Sibê voyênkomatê bê, ji nehîyê bijîkên bê. Gondê bi hatina min bihese, mirovê deste-deste bê. Hinekî pal din. Dîya min:

– Tu rast dibêjî, nama te hatinê hevtêkê gunduyêne me hatin, cûn! Bila gotina te be!

– Em wê gavê hişyar bûn, gava dûmmana êvarda ser gundê me da girtî, kişiyaye xwe daye bereka çîyan û te tirê tirêjîn tava payîzê herek bûye rimekê û ber hev didin. Em xewêda mabûn. Birê min derva dengê bavo bihistînê, revî xwe bi hesretî avîtine wî. Ew hate rûyê wî, ez û dayîk jî li hewşê bûn. Ewî destê Barî girt û ber bi me hat. Sibe xêrî da me û gote min:

– Mûsa, kurê bavo, pey taştêra here mala apê xwe, mizginê bidê wan.

Dîya min:

– Pî, qurbana zarê tebim Şemo, herim tivdîra taştê bikim.

Dîya min çû. Qasek derbaz nebibû li deriveze xistin. Ez revim deriveze vekim. Hema ku, min deriveze vekir apê min, çend qewm-lêzimên din û du-sê gundîyêne me hevra derbazî hewşâ me bûn, hema ku, bavo dîtin ber bi wî revin. Hev hemêz kirin, apê min hêşirê şayê barand. Pay wana sedrê şêwira gund, voyênkomatê nehîyê, bijîk hatin.

Mirov deste-deste kişyane ber mala me. Mêran rê nedidane jinan, jina rê nedidane mîran. Em şaswaz bibûn. Gelo ewana çawa hatina bavo hesîyane? Ê, dibêñ: “Erd jî bi guhe”.

Vê leze-lezêda voyênkomat û bijîk ji nava qefleyên mirovan derketin, xwe dane nîkekî. Voyênkomat bi dengekî bilind berbirî beşterbûya bû:

– Gelî hevalno, ez hîvî dikim, du-sê deqîqa guh bidine min.

Gişk cîyê xweda seqirîn.

Ewî gilîyên xwe domandin:

– Em hemû şane, wekî Şemo bi mîranî, bi serbilindayî dijî dujmin şerkirîye û bi serfinîyazî vegerîye! Ew hinekî nesaze, destûrê bidin bila ew bê derbazî hundur be, bijîk li wî mîzeke, paşê çavronahîyê bidine hev.

Bavê min hat, tevî voyênkomat û bijîk derbazî hundurbûn.

Axavtina wana êpêcekî kişand, paşê gazî dîya min jî kirin, min jî pey wê da gava. Bijîk berê xwe da dîya min:

– Qe metirsin, ez çi dibêjim usa bikin. Du rojan carekê pêçekê vekin, pêçîyan bi ava tin, ya dukelva bişon, rind zihakin, evî dermanî bide ser, girede. Hevtêkê, duda warma pêçîyan wê bikişe, xwînê bê dapalinê, birinê qenc bin.

Pey vêra ewana rabûn, bavo jî pêra em derketine pêşmalê. Me têderxist rengê bavo xitimîye, reşqemilîye. Voyênkomat û bijîk çûn.

Dîsa hatîyan dora bavo çît girtin, mirov jî hey dihatin. Evê dîdemê hetanî danê berêvarê kişand. Sedrê şêwira gund berbirî hemûya bû:

– Ez pêşnîyar dikim, bila her kes here mala xwe, serkarê xwe, îdî derenge, bihêlin bila camêrê Şemo hinekî hêminbe. Sibê na, dusiba emê sêrojka mêtvandarîya şaya hatina Şemo di klûba gunda bidin. Her kes jî erf-edetê me rind zane.

Pey van giliyaran mirov ji pêşmalê kişîyan, çûn, her tenê mirovênmeye nêzîk man.

Me qe nizanbû, ew du roj çawa derbazbûn. Li klûba gund heyte-holeke usa bû, mêtvandarîke usa bû, şayîke usa bû, te hewzanibû ruhê her kesî nûh bûye.

Erf-edetê gund ew bû, roja şaya mêtvandarîyê xwerin-vexwerin, ci hebûya binelîyêndi gund dihanî. Hinekan nan, hinekan xurekêndi cuda-cuda, penêr, toreq, ci bêjim, her tiştê xwerinê dihanîn. Ew mêtvandarî hetanî tarî ketinê erdê dihate domandin. Şaya bavo bû şaya ser şayara. Ewê jî bêjim almanê gundê me jî tevgelî şaya mêtvandarîya bavo bibûn. Ewana rex voyenkomat rûniştibûn. Min hey çavê Karî dinihêrî, ewî jî ez mêze dikirim.

Ez ser tiştekî metel mabûm. Min xwe-xwera digot: “Ev çîye? Wan mezina alman anîne kêleka xwe danîne rûniştandinê, lê hindik mabûm çavê min derxin? Digotin, rastî wan neyê, ew dujminin?

Paşê bavo bersîva pirsa min da:

– Xwedêgiravî bila alman bizanbin, em gelê Sovête timê serbilindin, him jî wana vî şerîda daye der!

\*\*\*

Payîzê koça xwe ji ser gundê me barkiribû, zivistana sala 1945-a ketibû qam-miqamên xwe. Pêcîyên bavo qenc

bibûn, her tenê ew hinekî dukulîya, carna gopal dida desê xwe.

Rojeke vê zivistanê dîsa voyênkomat û sedrê şêwira gund hatine mala me.

Wana kêfxweşîya me kirin. Dayîkê xwest wanra nin bîne, wana nehişt. Voyênkomat got:

– Xwîşka Seyrê, mera her tenê çayê bîne.

Dora destexana çayê voyênkomat firek, dudu çayê xistinê şûnda destê xwe danî ser pîlê bavo:

– Şemo bira, – got, – tu mîrekî çeyî, bi rûsipî deynê xwe ber welatê me qedandîye. Em bona pirseke pêwîst hatine bal te.

Bavê min:

– Keremkin!

– Zef spas. Em gişk rind zanin tu necarekî bi destemelî, ci çê dikî, hewasa mîriv pêra tê lê mîzeke. Hukumeta me dixweze ev almanê li gundê we û yên din bide xebatê. Têra dîtine li navenda nehîyê mîvanxanekê bidine ava kirinê. Teme dane me, nehîyê da hetar, kevirbir, dîwar hilçinî, necar û hosteyên xwedanê pêşekên din bibin tevî wan almana karê bikin.

Serbira bavê min nehat heta dawîyê guh bide wî û kîlimî:

– Biborîne, gava ez teze hatibûm, we derbarê vî tifalê min da ci digotî, ci ne digotin?

– Şemoyê bira, – îcar jî sedrê şêwira gund axivî, – her sehetekê hukumê wê heye. Bila lap Mûsa jî car-caran bê ber destê we bixebite, xwera pêşekî hin be.

bêm

bê a

êvar

wir v

min

got:

zêde

dibê

jî rê

zeki

hildi

desê  
wira  
nin  
payê  
synê  
wîst  
i bi  
eke.  
i din  
nekê  
kev-  
i din  
nî û  
ifalê  
- her  
n bê

Bavo:

- Gund 2 km dûrî navenda nehîyêye, ezê çawa herim, bêm?

Voyênkomat:

- Me ew pirs jî pêşda saffî kirîye. Maşina kolxozê wê bê almana hilde, paşê te hilde û sibe-sibe bibe ser kar, êvarê jî bîne mal. Çi alavên te henin amadeke, ci tune, li wir wê bidine te. Du-sê rojan şûnda hûnê dest bi kar bikin.

Şabûna min li erd-esmin hilnedihat. Hema wê êvarê min berê xwe da dê-bavê xwe:

- Wekî hûn bihêlin ezê herme bal almanan.

Wana êpêcekî çavên hev nihêrîn, ez mêze kirim, bavo got:

- Çend rojan jî sebirke.

– Erê lawo, – dîya min jî, – ser gotina bavê min da zêde kir, – bavê te rast dibêje.

Min qe dengê xwe nekir.

Roj dibûne gewlaz... Sibekê me herdu bira çawa dibên, dest dabûne desten hev, diçûne dibistanê, maşinek jî rê dagerîya ber mala me sekinî. Me zûr bû, maşinê mîzekir, avtoajo ji min bîrsî:

- Mûsa, rindiko, bavê te male?

Hema wê weşê bavê min ji derkete ber derveze.

Wana sibe xêrî dane hev, avtoajo gote bavo:

- Şemo birao, ez hatime pey te, te bibime nehîyê.

– Belê, ez zanim, çend deqîya sebirke, kelmelê xwe hildim, em herin.

Bavo vejerî ser me:

- Hûn herin, hûnê derenkî bikevin.

Em çûn...

Wê êvarê bavo êpêcekî dereng hate mal. Westîya bû. Dîya min av anî, ewî dest-piyêñ xwe şûst. Pey nan xwerînêra, ewî derbarê almana da, derbarê karê paşerojê da axivî. Alman pesinî.

– Bavo, – min gote wî, – roja ïnê ez jî tera bême wira.

– Erê!

Erê, wê rojê ez bavora çûme cîyê karkirinê. Aqareke fire, ber, dirêj hatibû rast kirinê, du deste mîr li wir beşter bibûn. Destek yên me bûn, yek alman. Çavê min wê deqîqê Dîtmar ket, ewî jî ez dîtim. Ez ber bi wan çûm. Karî nava wan çend almana derket û ber bi min hat, hê em negihîştibûne himberî hev, ewî deste xwe dirêjî min kir. Me destê hev germ-germ girtibû. Ewî destê min berneda, ez birme nava qelfê almana. Nizam ewî bi zimanê xwe wanra çi got, çi negot, ew kesana nêzîkî min bûn, destane min û navê xwe gotin:

Abêlard, Arnold, Êrik, Frîtz û yên din. Xêncî wana Dîtmar û Krîstof ji li wir bûn, gişkan jî bi almanî dipirsin:

– Wie geht es ihnen? (Çawanî?)

Min digot:

– Danke (Pakim).

Jî wê rojê da, qe na, hevtekêda du cara bavê xwera dicûme bal mirovên avakar-çêkrdarên mîvanxanê. Alman 20-25 kes bûn, mirov-hosteyên me jî, payê pirr bin desten wanda kar-dikir. Bavê min xwe jî, ji wan gellek tiştî hindibû. Ez ku dihatim Karî wê deqîqe ez ber desten xwe didame xebitandinê. Alîyê zimînda jî dijwarî hinekî kêm bibû. Ji ber ku, welger jî hebû. Ew xortekî cîwan bû. Ew jî

hero çawa karkarekî avahîkarê mîvanxanê dihate serkar, êvarê jî diçû. Hema roja ewlînda ez xweşa wî hatim. Tênûske bi pir belg da min û ez hinkirim wêya pêk binim çawa ferheng.

Hevtê pey hevtîyan derbas dibû. Min rind dixwend, him dersdar, him dîrêktor bi xemxur nêzîkî min dibûn. Min îdî dersxana 8-da dixwend. Her rojên betal-hêmîn bavê xwera dihatime ser avayê avakirina mîvanxanê. Li meydana avayî avakirinê çeqe-çeq, reqe-req, girmegirmeke usa bû hewasa mîriv pêra dihat. Mirovên me û alman îdî hinî hev bibûn, kar mîna ber destê mirovekî destemel dihate qedandin. Ji şer jî deng-besê qenc dihate bihistînê, ew jî bi radîoyê dihate serzaran, wekî şer ber bi dawîyê diçe, yên me hindik maye bi carekêva bere neyarke, ji welatê meyî Mezin revê bi wanxe.

Şabûneke mine din jî hebû. Karî ez hinkiribûm, min îdî bi rendeyê dep-texte rende dikir, mismar raste-rast lêdida. Karî digot, wekî destemeliya te heye. Tuyê bibî necarekî usa, wekî te bi tilîya nîşandin. Xwe jî dikenîya.

Rojeke Karî ne ser kar bû, necarek-dudêner mera çibû êwirgeha depan. Min depekî weke nîvmêtirî hilda, da ber rendê, darot, ev serî, ew serî zirav kir, nav qalim, bi gilîkî dîya xwera tîrîkek çêkir. Ew çendek bû tûrîka wê şkestibû. Rastî bêjim ser êpêcekî cercirim. Min xwe-xwera digot, wekî xuzula xweşa Karî bê.

Ew hatinê min tîrîk nîşanî wî da. Ewî ew da destê xwe, êpêcekî virda, wêda nihêrî, welger ew da serwextkirinê, ev bona çîye. Karî serê xwe hilbirî û li min nihêrî, got:

– Tu lezketîyî. Di nava herdu alîyada fîrqî heye. Alîkî hinekî zirave.

Min bi şabûn got:

– Tişt nabe!

Karî rûyê xwe tirşkir û bi neqayîlbûn berê xwe da min:

– Xwezila min mirana te bibihîsta, ne ku, ew gotina te: “Tişt nabe”.

– Tu dema usa nebêje! Ew yeka ku, tu dibêjî tişt nabe, wê hêdî-hêdî tera bibe xesîyet, ewê nava ruhê te da bêxemxurîyê pêşta bîne, tuyê bibî necarekî nivcî. Gilî bide min, wekî tuyê hetanî dawîya jîyana xwe, lap tiştekî biçûk jî, bê dil çenekî, wekî ez te hinî wê hunermendîyê bikim. Bizanibe her pêşek ew hunermendîye, ew ji qam, miqaman têne çekirinê, hûnandinê. Wedê notayêñ mûzûkayê ne cîyê xwedabe, konsêrt serê xwe nagire.

Ez sero-moro bûm û çawa dibêñ, bi lavayî bersîva wî da:

– Lo apo, bawerkin îro da ezê dilsarîyê ji xwe dûrxim!

Gava welger ev gilîyana wira gotin, ew dêm geş bû, destê xwe da ser dilê min:

– Ci dikî, – ewî got, – bi hizkirin bike. Bila dilê te ser her kar-xebatekê germbe.

– Bila!

– Bîrneke necartî jî nexşeke.

Ez dan bi dan, roj bi roj ber destê Karî û ji bavê xwe çawa alman digot hînî nexşen necartîyê dibûm. Lê carekê, gava min dep-texte bizmar dikir, bizmarek xar kir, pelixand.

Tu nebê Karî bin çavava li min mîze dike. Ew wêda hat bi dêmekî tûj, çakûç ji destê min stend û gazî welger kir û gotê:

– Bêje Mûsa xwezila ewî pêçike xwebihincranda, ne ku bizmar xarkira. Bila ew sê caran ser hev bêje:

– Xwezila min tilîya xwe bi hinciranda, ne ku bizmar xar kira.

Min nêta wî sê caran wekiland. Paşê ewî destekî xwe danî ser pîlê min pirsi:

– Du cara dudu, çi dike?

– Çar.

– Bila hetanî dawîya jîyana te, ne pirsa min, ya ku min qestbende da te, ne jî xarkirina bizmarê ji bîra te derneyê!

Rastî jî ew şîretê necarê min, hê jî bira min neçûye.

Min xwe têgihîştekî hetab hesab dikir. Him rind dixwend, him êpecekî hinî sira necartîyê bibûm. Ser van rojên şayê min da rojek jî zêde bû.

Min îdî dersxana 8-da dixwend. Sala ku, minê dersxana 8-a kuta bikira, dersdara serwêrtîya dersxana me mizginîk da me:

– Îsal li navenda nehîya me wê têxnîkûmê vekin. Şagirtên deh sal kuta kirî, dikarin herin ezmûnan bidin, 2 sala têxnîkûmêda bixûn, xilaz kirin dikarin, hesabdar, zootêxnîk-baytar bixebeitên, yên dersxana 8 kutakirî 3 sala bixûnin, xilazkirinê bibine dersdar. Nizam şagirtinên din şabûn, yanê na, wekî per-baskên min hebûya, şabûna ezê bifîriyama.

Hema wan rojan ser wê şabûna min da bavê min sibeke xweş da mizginîke din, ya ne ku bona me, lê bona rizgarîya mirovên dunê anî mala me. Ew ci bû? Ew çawa bû?

Meha gulanê bû. Rojêñ wêye ewlîn bû. Gundê me sero-pîya nava gul-nûra xuluqîda bû.

Bavê min rojekê, êvarê, ser şîvê gote me:

– Li min usa war tê ïsal bahara gundê me zû hatîye, rewşa wê jî kirâs-kirâs, bedew-bedew tê kivşê. Xwedê xérke, kî zane, diqewime ev yek here ser qencîyê, diqewime here ser xirabîyê.

Ew çend salbûn bavê min xwera kiribû xesîyet, her berbang radibû, ez jî xwera radikirim. Rojekê ewî gote min:

– Tu îdî xortî. Mêr gotî xewêda nemîne. Rabe bila tava sibeyê te germke; tava êvarê mirovan gernake!

Îro dîsa em tev rabûn, derketine derva. Mîna her car ew hinekî ber şêmîkê disekinî, têre-têr hewa dadiquta, paşê ji cîyê sekînî hêdî-hêdî dileqîya, diçû fitlek lode, serik tewle-gomê dixist, paşê gerek dida dora malê-carmedorê.

Ewê jî bêjim:

– Gom-tewlê malên gundê me payê pirr xanîk bû. Alîkî tewle bû, alîk gom. Nava wan hatibû birînê. Çawa her gundîkî me digot hetabî serê min be, ne dewarê minî usa zêde heye tewlê cêhê çêkim, ne pezê usa pirr heye gomê cuda avakim.

Wê berbangê bavê min jî odê derketinê derva, hema ber şêmîkê dengê radîoya gund hate bihîstinê. Ew cîyê

xweda qerimî, ji ber ku, radîoya gundê me rojê du cara dest bi axavtina xwe dikir: Nîvro, yek jî berêvarê. Ew ser dengê radîoyî vê berbangê şikber bû. Ewî gote min:

— Lawo, tu vegere mal, ez herim binihêrim, Xwedê nekirî, vê berbangê ci qewimîye, wekî radîoyê dengê xwe daye serê xwe.

Bavê min bi mitalê kûrva hêdî-hêdî ber bi stûna radîoyê da gavan. Qe nîvsehetê nekişand ew vegeři mal û bi dengekî bilind got:

— Tu ecêbê dunê binihêre! Wede dest bi şêr bûnê jî sib-sibe elametî dan. Vê berbangê jî ez gihîştinê ber stûna radîoyê bêjeweş bi dengekî şa, ser hev, ser hev digot, wekî li Bêrlînê derbarê radestîya leşkerê Almanîyayêyî tevgelî hatîye navandin. Hîtlîrê faşîst xwe kuştiye. Şer xilaz bûye.

Em gişk rabûn, bavo kete pêşîyê, me da pey wî û ber bi stûna radîoyê revin. Derew nîbe, hinekî şûnda biçük mezinê gund, dora stûna radîoyê çit girtin. Dengê şabûna wana bawerbikî digihîste erşê ezmîn. Desta sazbendên gundê me hetanî êvara dereng miqamên govendê, dilanê lêdan, dilan şen bi şen, fitil bi fitil hat, çû. Sibetirê dîsa ji berbangê binelîyên gund beravî dora stûna radîoyê bûn. Îro jî bêjeweş pey hev, pey hev digot, şer hatîye dawîyê, Almanîya bê qewil, bê gilî-gotin radestbûye. Ew 9-ê gulanâ sala 1945-a bû.

Wê rojê gellakan qurban dan. Yê ku, çawa dibêñ, dîkekî wan hebû, ew serjê dikirin, şayî didane derbaz kirinê.

\*\*\*

Şukur şer xilaz bibû, jîyan roj bi roj rewş bi rewş dibû. Kurt bêjim, min pey dersxana 8-ra çû ezmûn dan û têxnîkûmêda hatime pejirandinê. Ew sê sal qe nizanim çawa hat, çawa çû, hatim bûme dersdarê dersxanê serete. Min him jî necareti dikir.

Îdî min mekteba gundê me da ders dida şagirtên dersxana 2-a. Di nava wan saladan da gellek guhastin hatibûne kirinê. Nehîyêda mîvanxana dutayî, çend avayêñ jîyanê hatibûne ava kirinê. Ji almana sê kesan dunya xwe guhastibûn.

Merzelê gundê me fêza gund bû. Bintarêra çem dik-işya. Ser çem pireke pirr hên hebû. Ser pirêra derbazî alîyê rastê dibûyî, hinekî diçûyî merzel bû.

Ji almana yê ewlin mirinê bi xwestina min, bi pêşnîyara bavê min, bi hîvîkirina almanêñ din, ew himberî merzelê gundê me, vî alîyê çêm, alîyê çepê, hate defnkirinê. Ew cîkî rastî fire bû. Wê rojêda ew erd hate navkirinê merzelê "Almana", merzelên "Wana".

Çî hatîye bêjim. Hinek almanêñ din, yên ku, li navenda nehîyê dijîn, yên ku, gundêñ mayîn diman, berî mirinê vesiyet dikirin, dunya xwe guhastinê, bînin li merzelê gundê me, yên "Wana"-da binax bikin. Lema jî sal bi sal tirb li merzelê "Wana" zêde dibûn. Min jî xemxuriya wan gişkan dikişand.

Ez çûnê mektebê jî, hatinê jî rex merzelê "Wana"ra diçûm-dihatim. Min didît, heywan dikevîne wir, dicêrin.

Carekê jî min nihêri çelekek sturîyê xwe bi kevirê serkêlka alman dixurîne. Rika min hat, ez çûme derê mala

xwedenê çêlekê, wekî careke din heywanên xwe bernesdîne merzel. Ev hîvîkirina min zûtirekê li wan malên der-doran, li gund bela bû.

Hema wê demê hate hişê min, ez parezgehtîyê him li merzelê me, him li merzelê "Wana" bikim. Ev nêta min him xweşa bavê min, him jî xweşa almana hat. Rojekê, yekşemê çend hevalên xwera tevayî em çûne daristanê fêza gundê me û hinek çirpiyê darêن merxê, bîyan û pel-strîan anî û dora merzel çikand. Min çendekî şûnda ji wan daran, ji yên mayîn çarmediçor kişande dora merzel. Gundê meda apê Resûl baxvanekî bi nav-deng bû. Min ji wî hîvîkir, ew zû-zû dihate merzel û şêwir dida min, çawa bikim, wan daran hêşin û mezin bikim. Wî bi xwe jî dest li daran digerand. Merzelê me, merzelê hên bû, bi pergal bû. Min destêن xwe li kêmâsiyêن wê dere jî, digerand.

Wê rojêda xemxwirke mine din jî zêde bû. Bû sisîya:

— Dersdarî, necartî, yek jî parêzgehê merzel. Gundê meda çend Mûsa hebûn. Ser navê her yekî da paş gilîk jî zêde kiri bûn, wekî bizabin gilî derheqa kîjan Mûsayî daye. Minra digotin Mûsayê dersdar, Mûsayê necar, Mûsayê parêzgeh.

\*\*\*

Ê, sal mîna teyrêن koçer hatibûn û çibûn. Xwera jî êpêce qewmandin hanînbûn û biribûn. Dê-bavê min dunya xwe guhastibûn, berî mirina wan ez zewicîbûm. Naha jî qara malê û ya birê jî ketîbûne stûyê min. Ew çend sal bûn min danê sibê dersdarî, danê nivro necarî dikir, danê êvarê û rojêن yek şeman ji nava merzelan dernesdiketim. Min

him li merzelê gundê me, him li merzele almana mêtzkarî dikir. Mesele-metelokeke kal-bavadan dibêjin: “Hemû merzelên kêlsipî ne zîyarefîn, hemû kesên şasîksipî ne serdarin”.

Bila bi pesin nîbe ez bibûme serdar-serok û mêtzkarê herdu merzalan. Hatî-çûyî ser pergal û paqîşya wana heyr-hejmekar diman. Carekê derbarê min û herdu merzeladan da karkarekî rojnama nehîyê gotareke bi navê “Mirovek-sê pêşe” dabû weşandin. Paşê hate gotinê, wekî ew gotar li Almanîyayê, bi zimanê wan ronahî dîtîye.

\*\*\*

Carna dunyayêda, yanê jî quncik-hemêza wêda, bobelat, şipûkên xwezayê, yanê jî qewmandinên usa bi destêni mirovan diqewimin, mirovatî ser wan zendegirtî dimînin. Ji wan yek jî ew bû, rîjîm-rêvebirineke ku, bi xwîna mîlyon-mîlyon mirovan hatibû damirazandinê, bi kaf-kûf, bi wêran, bi sero-bino hate hilweşandinê. Bi herfê mezin binîvîsim û bêjîm-Ew Yekfîya Rêspûblîkê Sovêtêye Sosîalîstîyê bû. Bi wêva barekî duneyî xar bibûyî, rast bû û bêjîmar qeyd, zincîrên dest-pîyên mirovan rizîya bû xulîya bin piyan. Îdî ew çend salbûn ji wê rêvebirinê tiştek ne mabû. Min dîsa hersê pêşen bi navê xwera girêdayî didomandin. Sal ew sal bû, wekî him li hemû Rêspûblîkê Sovêtêye berê, him hemû aştîhizên gerdûnê amadebûn sersalîya 60 salîya altindarîya ser Şerê Hemdunyayê Duda bidine kivşê, çawa dibêñ, wê roja dîrokî, ya şâ bîrbînin.

Dîsa roja yekşemê bû. Das destê min da bû, min çawa digotin li merzelê “Wana” da kaxtî dikir. Vê demê du

karî  
emû  
ser-  
  
karê  
wana  
erdu  
javê  
vekî<sup>1</sup>  
  
êda,  
a bi  
girtî  
i, bi  
î, bi  
ærfe  
tîeye  
bû û  
ulîya  
k ne  
dayî  
likên  
ebûn  
Duda  
  
çawa  
ê du

avtomaşin ber merzel sekînin. Ji wan avtomaşina hevt kes peya bûn. Min ji wan pênc kes nas kir. Çar kes karkarêne nehîyêye qedenkar bûn, yek rojnamevanê ku, derbarê min da gotar nivîsî bû. Lê du kes nasnekir.

Wana raste-rast berê xwe dane merzel, ber bi min hat-in. Min jî dasa destê xwe wêda danî û ber bi wan çûm. Ez ji çarmedora merzel derketim, gavek, dudu ber bi wan avît û em gihîştine himberî hev. Wana hevra-hevra selam dan û destêne xwe dirêjî min kirin. Min jî dest da wan. Ew du mirrovênenas dihatine kivşê ji welatêne derekenin. Min yek ji wan şibande Karî. Serwêre çand û hûmanîtarîyê, yê nehîyê Hesen Mecîd, bi hizkirin milê min girt û got:

– Mûsayê dersdar, Mûsayê necar, Mûsayê parêzgeh, rûmetbilindo, ev du maqûl (ewî tilîya xwe, dirêjî herdu mirrovênenas kir) ji Almanîyayê hatine. Tirbêne pismamêne xwe digerin. Em zanin te 10 salîya xweda li almanêne van-derara dostî kirîye, paşê jî li merzelê wan bûyî xweyî, te ew mîna bîrdarêne dîrokî parastîye.

Welgervan ew gotin bi almanî wergerandinê şûnda, ew kesana yeko-yeko hatine rûyê min û gotin:

– Zef, zef spas!

Min jî bi almanî gote wana, wekî hûn serseran, serçavan hatine û ez jî spasîya xwe dime we.

Ewana gellekî dêmxwesbûn. Ez nêzîkî wî kesî bûm, yê ku, min şivandibû Karî. Min bi almanî gote wî:

– Almanek hebû navê wî Karî bû. Ez 10 salîya xweda wira bibûme nas. Paşê bûne dost, ew bû hoste-dersdarê min. Ez te dişêvînme wî rehmetlêbûyî.

Vê gotina minra ewî dest ustuyê minra bir û te hew dizanibû bîn lê hatîye çikandin, nîşkêva kire îskînî û hêşir barand.

Weşeke xurt derbaz bû, ewî got:

– Ez Karî kurapê hevin, kurê birakî ew, kurê birakî ezim. Ez xût bona wî hatime derketime vira.

Hinekî seqirîyê hingavt, paşê ewî destê min girt, kire nava lepê xwe û çend çirk derbaz bûnê şûnda got:

– Navê min Kohêne.

Nizam ewî dîsa çi dixwest bêje, min rûyê wî mêzekir, dihate xanê ew xitimîye, lê ez berbi merzel zivirim, berbirî wî bûm û bi almanî got:

– Maqûl Kohênen, naха pey min warên tirbêñ mayînra tevayî, ez tirba apê xwe Karî nîşanî we bikim. Min wira apo digot.

Ewî qe tiştek ne got, her tenê nêzîkî min bû, destê xweva hêdika, çend cara, pişta min xist. Min derîkî bilindaya mêtîr nîvekê ber merzel xistibû. Dora merzel bi darêñ cuda-cuda dava hatîbû çarmedorkirin. Nava daranda darêñ dirîyaye çikandî, lêlavkêñ wan alîyayî çarmedora dora merzel sext-sext, rewş bi rewş kiribû.

Min ewana birne ser her tîrbekê. Wana her tîrbek bi ecêb mêze dikirin. Herdu almana destêñ xwe didane ser serkêlkan, bin lêva çi digotin, her wana zanibûn. Gava em hatine ser tirba Karî kurapê wî jî, almanê din jî, bi destmala destê xwe, wêneyê ser kevire serkêlkê neqîşkirî paqîş kirin û ew mac kirin.

Çawa dibêñ, bîna wan hatinê ber wan Hans got:

hew  
nêşir  
  
irakî  
  
kire  
  
ekir,  
xbirî  
  
yînra  
wira  
  
destê  
lerikî  
el bi  
anda  
dora  
  
ek bi  
e ser  
a em  
î, bi  
işkirî

– Mûsa, wekî her almanek bi kara teye bê himber bi-hêse, wê bêje, tu ronahîya çavê minî!

Kohêن jî hat nikî min sekinî, paşê şanî da Hans jî hate bal me. Wana ez kirime nava xwe û wêne dane kişandin.

Kohêن berê xweda min:

– Mûsa, – ez bal van kesa dibêjim, – tu îro da birê minî heta-heteyî, biratîya min bipejirîne.

– Biratîya te, – min bersîva wîda, – sersera, serçavan.

Desta mirovên hatî épêcekî nav merzel gerîyan. Îdî wana her tirbeke almana zîyaret, mêzekiribû. Ewana beravî cîkî bûn wêne kişandin. Pey wêne kişandinêra Kohêن berbirî beşterbûya bû:

– Hema naha ez hatime ser wê nêtê, wekî mirovên mîna Mûsa jîyanêda ser tilîya tê jimarê. Ez xwedanê milkekî giranim, bi rastî bêjim, minra bigotana karekî awa bê hêja bike, diqewime min ew nana bikira. Ezê Mûsayê birayê xwe bibime Almanîyayê, ci pêwîste ezê bikim, him jî bila gellek bi kar, zehmetê Mûsa bihesin. Him jî, wekî Mûsa bixweze, ez dikarim wî bi malbetêva li Almanîyê cî-war bikim.

Min li her yekî wan meze kir û got:

– Kohênenê bira, wedê li vira, gişk ji çend almanê xerbend direvîn, ez deh salîya xweda diçim-dihatime bal apê Karî û yên mayîn, qe nedihate hişê min û hişê tu kesî, wedeyê bê, hinekê bêñ bêjin, Mûsa were, em heqê zehmetê te bidin. Na, na!

Naha wekî ez wera herime Almanîyayê, bibime xwedanê hinek tiş-miştan, ew karê min kirî, wê li min heranbe.

Paşê min destê xwe dirêjî gundê me kir û axavtina xwe domand:

– Berî her tişî, biçûk û mezinê vî gundê me, wê pişta xwe bidine min, qerfê xwe bi min bikin, wê min ne gazî şayê xwe, ne şînê xwe bikin, ewê bicedînin ez ji gundê kal-bavêن xwe dürkebim. Apê Karî û almanêن din ji rûyê ne-heqîya dewran xwe, dero-dero bûn, ez jî rabim bona malê dunê ji gundê kal-bavêن xwe derkebim. Ew ne rêke raste.

Pey ve axaftina minra gişkan rûyê hev mîzekirin, kirtînî ber tu kesî neket. Çend deqîqa şûnda serwêrê çandê, yê nehîyê Hesen Mecîd hat rex min sekinî û got:

– Te her tişt rind anî serzaran.

Paşê ewî bi dengekî bilind got:

– Diqewime hineke din jî dixwezin biaxivin.

Deng ji tu kesî derneket. Ez gavekê-duda pêşta hatim û bi rûkêن got:

– Lê bizanibin eva çend salin xwestin û daxwezek dilê min dison. Bihêlin naha xwestina xwe wera bêjim. Piştî çareserîya xwestina min, ezê daxweza xwe bêjim.

Kohêن bona van gilîyan şabû, hew-dizanibû ez qayîlbûm, wekî wanra herime Almanîyayê, lema jî bi dêmques bêjand:

– Xwestin û daxweza te serseran, serçavan, li welatê me ci bixwezî, emê cî bînin.

– Kohênenê bira, welatê we dûre, xwestina min nêzîke. Ez dixwezim deh textebendêن bi palpişt bêne çêkirinê. Min wênexêzan wan textebendêن palpişt jî kişandîye. Deqekê, duda sebirkin, ez herim wan wênexêza bînim nîşanî we bikim.

Çentekî destê min hebû, min timê ew xwera hildida. Ew ber derê merzel bû. Min çû ew anî û ew wênexêz derxist da destê xwe û axavtina xwe domand:

– Wan textebandan amadekin bîne merzel, piştî wê ezê him menîya çêkirina textebenda bêjim, him daxweza xwe qalkim. Wan textebanda li nehîya me dikarin bidine amedekirinê.

Kohên wê weşê destê xwe dirêjî min kir, kaxizê wênexêzan ji destê min girt û got:

– Ezê cîyê çêkirina wan textebenda ji bersîvdaran hîvîkim û bi xercê xwe wan deh textebenda nava çend rojêñ nêzîkda bidime amedekirinê. Lê Mûsayê delal, ez dilê xweda şabûm, min tirê tuyê bêjî ezê wera bême welatê we. Min berê xwe da Kohên:

– Kî zane diqewime rêya dirêj kurtbe, ez jî neyême welatê we, ewledên min bêñ. Îro ew pirs ne ewqasî ferze, ya ferz ewe warêñ em ji vî merzelî derbazî merzelê gundê me bin.

Gişkan hevra-hevra gotin:

– Erê, erê, ese em herin.

Min da pêşîya wan, em ji vî alî çêm derbazî wî alî bûn, sekînîn. Min fate da. Paşê em ji vê rêza tirban, derbazî yeke mayîn dibûn û em hatin gîhîştine rêza tirba dêbavê min sekinîm. Ewana rex hev hatibûne binaxkirinê. Berî min Hesen Mecîd destekî xwe danî ser serkêlka tirba bavê min, yek danî ser tirba dîya min û got:

– Mêvano, bizanibin eva tirba bavê Mûsaye, ev jî ya dîya wîye. Rehma Xwedê li wanbe, cîyê wan cinetîbe, wekî ewledekî mina Mûsa anîne dunê.

Em merzel seranser gerîyan, tîrbek ji yeke mayîn paqîş bû. Ev gişk hafîya karêن Mûsayî giran dide kivşê.

Mûsa tu dema cudadî nekirîye nava vî merzelî û wî merzelî. Ji vir jî, ji wir jî gul-nûr, paqîşî dibare. Ez deyîndarim bêjîm, Mûsayê camêr ev gişk bi hêza xwe, bi rezedilîya xwe kirîye.

Kohêن jî dest bi axavtinê kir:

– Mûsa, te bi van kirinêن xweye li vî merzelî, li wî merzelî heta-hetayê dê-bavê xwera peykel danîye, him jî bila ji quncikê dunê bêن binihêrin mirovtayî cî qenderên şirînin.

Min razîbûna xwe da wana, vê gavê serwêrê, çandê yê nehîyê Hesen Mecîd got:

– Îdî derenge, mîvan birçîne, werêن em herine xwerinxanê.

Min jî ser gotina wîda zêde kir:

– Ev pêşnîyar bi dilê mine. Kî ku ji dûr, nêzîk tê gundê me û neçe xwerinxana wêda xurek, kababan nexwe, wê heta-hetayê poşmanîyê bikişîne, li wir ezê we bi pirseke din bidime şakirinê.

Em jî nav merzel derketin û berbi xwerinxanê çûn. Ez ketime pêşiyê, mîvanêن ji dûr-nêzîk dane pey min.

Xwarinxane êpêcekî fêza merzelan di nava didem, rewşa xwezayêda hatibû avakirinê. Dorhêla wê daranvan hatibû wergirtinê, pişta avayê xwerinxanê li zinaran asê dibû. Jorda avêن kanîyêن tev hev bûyî dikire xuşe-xuş, nikî xwerinxanêra dikişîya, xweşawaz dihate guhê te. Bîna kulillkêن der-doran tevî xweşawaza avê dibi bû û her kes bi ruhê xwe ges û xweş dibû. Wedê mirov digîste xwar-

ayîn  
wî  
Ez  
e, bi  
  
li wî  
im jî  
lerên  
andê  
erine  
  
ik tê  
xwe,  
e bi  
  
a. Ez  
dem,  
nvan  
asê  
-xuş,  
Bîna  
t kes  
xwar-

inxanê, bîna xurekêن cuda-cuda tevî vê hebûna xwezayê dibû û mirovêن van derara nenas dihejirandin. Naha herdu mîvanê ji Almanîyayê ketibûne wê rewşê.

Dema em gihîstine ber şêmîka xwerinxanê xweşmîrekî em pîşwaz kir, xêr hatina me anî serzaran:

– Keremkin, derbazî hundurbin.

Paşê kete pêşîya me û em anîne odeke cuda, herdu mîvana şûpênenê (plaş) xwe derxistin derbendêda daliqandinê şûnda, gişk rûniştin. Lê çavêن Kohêن hey li derbendê bû. Min ev yek tê derxist û pirsî:

– Maqûl Kohêن, biborîne, hûn usa bala xwe didine çî?

Ew hêdîka ji cîyê xwe rabû hat pêşberî derbendê sekinî û destê xwe danî ser wê, got:

– Evê derbendê wê deqîqê bala min kişande ser xwe, nizam çîma?

Ez jî cîyê xwe rabûn hatim nîkî wî sekinîm û berê xwe da wî:

– Kohêنê maqûl, bi rênîş û serkarîya Karîyê rehmetlêbûyî min ew derbend çêkirîye û çawa xelat daye xwarinxanê.

– Lo birano, – Kohêن bi dengekî ricav got, – hela ecêbêن dunê binihêrin, berî şêr him mala me, him mala apê min, bavê Karîda derbenda awa hebû. Ewa apên min hinî Karî kiribû.

Piştî van gotina Kohêن bi destmala desta hêşîrên çavêن xwê paqîşkir û hate rûyê min. Vê gavê xizmetkareke bedew ya ku, ji bêjin-balê gul-nûr dibarî, hate hundur, selam da û destexan raxiste ber mîvana. Wê wêda du xort xizmetkarîya

me mîvana kir. Çawa dibêن, destexan tijî dibû, vala dibû.  
Pey xwarina kibabaran Kohêن berbirî min bû:

– Mamoste Mûsa, hemû xurekêن we, cuda kibabêن we, omanca we heta ez saxbim tema wan ji devê min wê neçe, lê ez nehêmînim, te gilî da, wekî tuyê vira mizginîkê bidî me.

Ez vebîşirîm û min got:

– Belê, belê usane. Mêvanêن hêja, rind guh bidine min. Carna dinêda tiştên usa henin, ew ne bi hebûna dinêva têne kîrinê, ne têne firotanê. Mamosteyê min Karî tu nebê, pey hatina gundê me, kere-ker bîranînê xwe dînivîse. Wedê ew nexwêş bû ez hero diçûme bal wî. Rôjekê ez û ew tenê bûn. Ewî sê têñusk ji bin balgîyê serê xwe derxist da min û got:

– Mûsa can, gilî bide, tuyê cara dawîyê jî, gura mamosteyê xwe bikî.

Min herdu destêن wî dane ser singê xwe û gote wî:

– Ez beqî keda van destê te hatime gîhîstîme vê bilindayê. Bona ew ked lî min heram nebe, bi şîrê dîya xwe sond dixwim, her tenê mirîn tunebe, tu çi bêjî ezê jîyanêda mîyaserkim. Yek jî dixwezim tiştekî din apê xwera bêjim, wekî tu daha hêmîn, hêmînbî. Jîyanêda mirovê henin, çawa dibêن, ji ber dîwêr wê datir neçûye. Lê usa diqewime yekî din, yê ku, dilê wî qencîyava tijîye, destê wî kesê ber dîwêr rûnişti digire, radike û jîyanêda bi her alî dibe piştovane wî. Ew kesê ber dîwêr nava wedekî kurt û dirêjda dibe xwedanê nanê petî, dewlemend dibe, çavêن wî lê hurpizî dibe, bînê pîyê xwe nabîne, dema, rastî piştovanê xwe hatinê selamê jî nade wî. Ew ji rêya heq,

rast derdikebe, dixalfe. Dibe heywan. Na, na! Firqîya wî û hinek heywana heye. Bavê min digot, carekê ez hespa me sîyar bûm û çûme gundekî çîyayî dûr. Paşata, berêvarê vegerîyanê payîza dereng bû, rêda dûmaneke usa req-sextê rabû, der-dor kire nava tarî, tarîreşka xwe min rê şas kir, xalifîm. Min hesp kîjan alîda dajot nizam, cara diçûm rastî newala-gelya dihatim, çarna diçûm rastî zeran, zînaran dihatim. Nîşkêva gotineke kalîkê min kete bira min:

— Sîyarî dûmanêda xalîfînê serê hespê berde ewê bi xwe te bîne derê malê. Min gema hespê destê xweda sist kir, wedekî şûnda min nihêrî ez li nava gundê me dame. Ez peya bûm, hatime herdu çavên hespê. Hesp jî heywane, le li derê malê xoyê xwerîye, av vexwarîye, dora malê tewlandine, cêrîyaye, lema jî, jî rê nexalifye:

Naha kê minra bêje, hinek meriv heywanîn, bê nanxowêne, yanê hesp?

Pey van gotinê minra ewî awa nêtên xwe domandin:

— Wan tênuşkada min bîranînê xwe nivîsîne, rojekê wan bibe bide baylozxana Almanîyayê, ya li Azerbaycanê, lê leznekebe kî zane diqewime tu bi xwe çûyî Almanîyayê, yanê jî kesek jî me bê dere vira. Min derbarê nav-nîşana xweda, mal-malbeta xweda bi firetî nîvîsîye, tuyê bi hêsa herî derêyî ser xwestina min. Şukur tu almanî zanî, destnîvîsara min ji hesa dixwînî!

Kela girî tijî qirika min bû, lê gilîyên xwe domand:

— Sê rojan şûnda ewî dunya xwe guhast. Kohêن, mîvanê ezîz, îro ezê wê bîranînê bidime te. Navê bîranînê awaye: “Bila Mûsa hebin, şer tunebin”.

Gişk rabûne ser pîya û hevra-hevra wekîlandin:

– Bila Mûsa hebin, şer tunebin! Lenet li şeran û dêwrenê xirab!

Pey seqirîyêra Kohêن bi dengekî lavayî pirsî:

– Mûsayê maqûl, ew bîranîn li kuye?

– Ew bîranîn min kirîye nava kincêن bavê xweye şêr û mîna ronahîya çavan parastîye!

Pey peyva mine dawîyêra Hans mîna cîwanekî xwe avîte min. Ewî bi destêن xwe pişta min nerm-nerm kuta û got:

– Maqûl Mûsa, her karekî te qedandî ne ku, bona mirovîkî, duda, lê bona mirovan xemxurî, xemildarîke usane gotî dîrokêda bimîne û dewir-dewir bê gotinê.

Kohêن û yên mayîn cîyê xweda te tirê qerisîne, lipitandin bi wan ne dibû.

Hans herdu destêن xwe dirêjî mêvana kir:

– Gelî birano, – got, – hûn çîma sekine, rabin em herne mala maqûl Mûsa û ecêba bi dorê bi çavêن xwe bibînin.

Em ji xwerinxanê derketin û berbi mala me çûn. Dîsa ez ketime pêşiyê. Em ku, hatine hewşa me dayîka zaran-Baharê kincêن şûştî ser şîrîte radixist, ewê em ku, dîtin destêن xwe bi pejgîra dalîqî paqîş kir û nizan bû pêşta bê, yanê here mal. Min bi zimanê dê, bi kurdî gote wê:

– Bahar, pêşta were ji Almanîyayê mêvanê me hatine.

Ew herdu mêvanê alman bi ecêb li wê mêze kirin...

Ewa bi şerm gavek-dudu ber bi me hat.

Bahar çav Kohêن ketinê cîyê xweda sekînî. Min derzkar ewê Kohêن şivande Karî, lema jî min gote wê:

– Navê vî maqûlî Kohêne, ew kurapê rehmetlêbûyî Karîye.

Ewê hêdîka got:

– Ewana bi xêr hatine.

Min ev gilî-gotin wergerand. Vê weşê kurê minî mezin jî wêda hat. Min, him dîya zaran, him ewledê xwe mîvanara kirine nas, got:

– Navê jina min Bahare, bahar bi almanî-Frûhlîngte; navê kurê min Karîye-karî bi almanî-Pilz(e).

Kohêne bi şabûneke erd û esman got:

– Mûsayê bira, him weteya navê te, him ya xanima te, him ya kurapê min Karî jî kurdî welgerandinê bi almanî dibe şîrînaya devê mirovan.

– Belê usane, – min bersîva wî da, – lê cuda ser navê Karî du-sê gîlîyan bêjim. Roja rojda navê Karî xweşa me gişkan hat. Yek jî gundîyên me bawer bikî gişk karîya hez dîkin, him jî tem-lema devê min ew karîne.

– Dijware em xwe himberî te bigirin.

Hans ser nêta Kohênda zêde kir:

– Pirsa nijadîyê pirseke ferze, him jî van çîyan-banîyan, hêwa van dera dayîneke nebînyayî daye te. Ez ewê jî zanim Kurd û Çîyan hevra xuliqîne.

Em hev kenîyan û min gote Baharê:

– Here kincê min, yên leşkerîyê hema usa pêçayî bîne dayîne ser masayê.

Ewê wêda kinc anî danî ser masa derva. Gişkan vege-rî çavên hev mîzekirin. Ez pêsta çûm, min dest avîte buxçê kincan vekir, mîvana gişkan dora min girtin. Kohêne û Hans xwe ser buxçeda mîl kîrin. Min buxçe vekir, mî-

dala min ser kinca hate kivşê. Min dest avîtê hersê tênuş-kan, ji bin buxçe derxist, destê xweda xayîkir, paşê virda, wêda nihêrî û dirêjî Kohêن kir û gote wî:

– Bicedîne evê bîranînê, vê dîrokê biweşîne. Wekî ew yek wera li hev neyê, van emaneta silsileta dahatîra xweyîkin.

Kohêن her sê tênuşk ji deste min mina tiştekî nedîtî girt, bi herdu desên xweva ew danîne ser sîngê xwe, qayîm-qayîm givaşt, te tirê hinekê wana ji destê wî birevînin. Peyra tênuşk hildan danî ser çavêن xwe, bire ser lêvê xwe, ser hev maçkir. Hans jî hat çawa dibêن, alîyê tênuşkêye mayîn da darda bû, çavêن xwe, dêmêن xwe yeko-yeko li wan gerand û ber xwe da ci digot, ci ne digot her tenê Xwedayê wî zanîbû.

Roj dagerîya bû, berêvar bû. Serwêrê çanda nehîyê Hesen Mecîd berbirî me bû:

– Ci ku îro me dît, ci ku bihîst gişk ne ku hêjayî pesindayîna rojekêye, lê bi gorîya min, evê bi salan bêne gotinê.

Rabin em vegerine nehîyê. Emê çend rojan şûnda textebenda hildin bêن, kabine merem-daxweza Mûsayê birêz ci bi çinin?

\*\*\*

Her meheke rojgarêن salê li gundê me bi rengê xwe, bi rewşa xwê xweşin, ew zerin, sorin, sipînin, him jî bi bîn-bereket û dewlemendin. Lê min tirê meha gulanê sertaca hemû mehayê. Naha jî meha gulanêye. Eva çen-deke çavêن min li rêye. Do ji nehîyê minra bersîv şandin,

wekî îro wê textebenda bînin. Hema ez nava van mitala da bûn, dengê maşinan li min tesele bûn. Min ji nava merzel qameta xwe rast kir, rê nihêrî.

Min dît wêda maşineke barbir û çend avtomobîlên sîyarbûnê têن. Ew hatin ber çarmedora mezelê "Wan" sekinîn. Ji wan 15-20 mirov peya bûn û dora min çit girtin. Ji wana çend kes peywîrdar, karkarêن çapemeniyê, rewşenbîrêن ji nehîyê, gund û pale bûn. Serwêrê çanda nehîyê Hesen Mecîd gavek-dudu pêşta avît, ji nava qelfêن beşterbûya derket û berê xwe da hemûyan:

— Hevalno, kî zane xwe zane, kî nizane em bona çi li vir civîne, ezê kurt bêjim. Mûsayê dersdar, Mûsayê mêzekar, Mûsayê necar hê ji 10 salîya xwe da ew almanên ku, hatibûne vî gundi tevî wan têklîyê xwe çêkiribû. Paşê ew têklî dibe dostî, dibe xizmetkarîya him zindîyan, him ya tîrbêن vî merzelî.

Eva çendeke du alman hatine vira û tîrbêن qewm-pismamên xwe digerin. Ji wana yekî beqî Mûsayê rîzdar li vî merzelî rastî tîrba kurapê xwe hatîye.

Em wê rojê jî hatibûne vira. Gellek pirs hatine zelal-kirinê, ser hinek girefikan hatine vekirinê.

Mûsayê mêzekar hîvîkir, wekî li navenda nehîyê deh textebenda bidine çêkirinê, bîne merzel û ezê daxweza xweye salan beyan kim. Me birîyar kir, wan textebenda bi xercêن xwe çêkin. Lê kurapê Karîyê rehmetlîbûyî maqûl Kohênen ji Almanîyayê hatî nehîst. Got kurapê min, li vî merzelîda hafîye defnkirinê, hinekî jî em zehmet bikişînin bila her tişt bi helalîbe.

Belê, bi xercê wî maqûlî textebend hatine çekirinê û me îro ew anîne vira. Bila pale wan textebenda ji maşina barbir valakin, paşê emê tîvdîra xwe bidomînin.

Textebend hatine vala kîrinê. Vê weşê Hesen Mecîd hat nikî min sekinî got:

– Mamoste Mûsa, naha keremke, çawa dibêjî em usa bikin.

Piştî van giliyara karkarêن têlêvîzîyayê kamêra te-wrandin, yên radiyoyê diktafon girtine xwe û hatin nikî min sekinîn, gotarvanêن rojnaman pêñûs-teknûsk destada hîviya axaftina min bûn. Ez nêzîkî karkaran bûm cî nîşan-kir, wekî textebenda çawa di nava herdu merzelada cî-war bikin. Vî karî êpêcekî kişand. Min der-dor jî da paqîşkirinê û hatim fêza gişkan sekinîm û dest bi xwezila xwe kir:

– Hevalno, mîvanên rêzdar, yên ji dûr û nêzîk hatî, Xwedê sebirê bide we, diqewime ez hinekî zêde biaxivim, pêşta lêborînê dixwezim. Her ku, min bi salanva xizmet-karîya van herdu merzalan kîrinê, pirsekê dilê min disot û ewê şax vedida, qiloç dida. Min xwera hey digot, xwezila rojeke usa minra li hev bê, ez ya dilê xwe beyam bikim. Him jî meseleke kal-bavan ne dihîş hîviya dilê min bi-hêle: “Sal bi sal, xwezil bi par”. Bila rind bê derzkirinê vi-ra pirs ne derbarê malê dunêdaye. Sal hatin derbas bûn, rastî jî îro xwezil-daxweza min bi par bû, yanê ku, ewê çâ-reserîya xwe dît. Çawa? Ezê destexana dilê xwe ber we vekin, hûn jî binihêrin ser wê ci hatîye dayînê û hêja wane bê himber ci bi ci daye?

Min çavêن xwe li beşterbûya gerand, welgervan nava herdu mîvanên almanda bû û gotinê min radigîhande

wan. Ji  
dîrêkto  
malbet  
çavêن  
dûmayî  
guneh,  
milked  
din. Hi  
hinek c  
şeran r  
Di

Çend n  
hîv, zî  
usanin  
himber  
zanbin.  
dunya  
dunîya  
zane, k  
biaxivî  
gerdûn  
vê dun  
da qe ti

Ew  
hinek d  
bawerm  
peytand  
ewqas, |

wan. Ji gund jî, sedirê gund, qedenkar, katibê şêwira gund, dîrêktorê dibistanê û êpêce mirovên din, him jî endamên malbeta min, qewm-lêzin li vir beşter bibûn. Her kesî çavêن xwe kuta bû min û ker-lal sekinibûn. Min awa dûmayîn da nêtên xwe:

– Bi gorîya min li rûbayê dunê ew mirov tune bê guneh, bê tawanbe. Mirov hene têن dibine beg, axa, mîr, milkedar, padşah, wezîr, kral, prezidînt, serekwezîr û yên din. Hinek ji wan aştîyê digerin, hinek şêr, dew-dozê, hinek cîyê sekinî, bona hebûnê xwîna mirovan dide rêtinê, şeran radike.

Dibêن dunêda ci ku, hatîye xuliqandine gişk zo-cotin. Çend minaka bînime holê: Mêr û jin, nêr û mê, şev-roj, ro-hîv, zivistan-bahar û yên mayîne bê jimar. Evana tiştine usanin her yek me zane, lê dixwezim pirseke mayîne himberî vê dunyayê bikim, wekî ya heyîtiya dunya din bizanbin. Li gerdûnê mirov payê pirr dibêن her tenê ev dunya heye, ew ronahîye, dunya din tarîye. Lê wekî ew dunîya din tune, çima dibêjin dunya din tarîye? Kesek ni-zane, kesek ji wir nehatîye, wekî em ruhberê bi zar-ziman biaxivin, bihîş bizanibin rastî kuye? Kî zane diqewime yê gerdûn xuliqandî usa xuliqandîye, wekî bila mirov derbarê vê dunêda hinekî kêm-zêde bizanbe, lê derheqa dunya din da qe tiştikî nizanbe!

Ewê jî dibêjin, wekî meriv mirinê hinek diçine Cennetê, hinek diçine Cehennemê. Vê pirsêda jî mirov parevebûne ser bawermendan û nebawermendan. Kê rabe bide rastandin, peytandin ku, kî rast dibêje, kî derewa dike! Qe derew ewqas, bi sal-zeman, bi dewir bi dewir tê domandinê?

Ew wê jî tînine serzaran, wekî mirov bona emelên xwe, bona jîyanêda mîyaserkirina karê xwe hinek diçine Cennetê, hinek diçine Cehennemê. Dibên, yên ku diçine Cehennemê şev-roj beroşen qirê-qetîranêda dikine qirînî:

– Heylo, heylo, hewar, hey hewar ez şewitîm, ez peritîm, ez keliyam, ez qeliyam, ez kiziyam! Lê bila her mirovek, kî dibe bila bibe, bizanbe ceheneme jî, cenete jî li vê dunê qezenc dike.

Min vira avek xwest. Xortekî wê deqîqê ji nava beşterbûya derket, berbi kanîya nava herdu merzela revî, şerbikê li wir têwarda, ew tijî kir anî da min. Min şerbik da destê xwe û got:

– Beşterbûyên bi rûmet, usa derzkin ez niskekî mirovayê me, dilê min dişewîte, lema jî dibêjim:

– Gidino, nehêlin ava dunyayê bê şêlükirinê!

Paşê min av vexwar û dûmayîn da nêtên xwe:

– Ezê naha daxweza xweye salan, birina dilê xwe derevekim:

– Xwezila rojekê bi tevgelîya serkar û rêvebirên dewlet û hukumetên welatên gerdunê, yên bi hêz li nava van merzelada Qurultekê, Çivînekê, Konfransekê, Bilindcivînekê, yanê jî Rasthatineke bi heqî, bi rastî bona pirsa enenekirina çarenûsa gelan, ya mirovayê bidine derbazkiranê. Diqewime yên ku, xwe rêvebirên gerdûnê hesab dikin ser hişê xwe da bê, wekî bizanbin wana tu ruhberek nexuliqandîye. Lê çîma bi zordestîya xwe vî gelî, bi gelê din dide qirê. Bila nava ruhê wan zalimada ew rehim, ew fehm pêşta bê, wekî her tiştî tenê xwera nexwezim.

elên Welleh dîroka zaliman zû, yanê dereng bi xwînêva tê  
çine mewcandinê, giranîya wan jî dibe, weke kaşa kaya ber bê.  
çine  
nî:  
, ez  
her  
te jî  
nava  
revî,  
k da  
nîro-  
xwe  
irên  
nava  
ekê,  
tona  
der-  
esab  
erek  
gelê  
, ew  
zim.

Pey van gilî-gotinara min xwe kerkir û da gava hatim ber textebenda sekinîm. Hemû kesî berê xwe da min. Min navê Kohêن û Hansêن kişand û ew gazî bal xwekirin. Min milê wan girt anî ser textebenda da rûnişstandinê. Peyra milê heyşt kesên bi rûmet girt, anî bal wan da rûnişstandinê. Derbazî pişta wan bûm û bere xwe da miro-vêner vê derê:

– Ez bi gorî, hûn jî warêن alîyê minî rastê û çepê ser van maqûraran bisekinîn, bila wêneyêن me bê kişandinê.

Karkarêن têlêvîzorê, keç-xortan bi têlêfonê destan pey hev, wêneyê vê dîdeme kişandin. Min bi dengekî şâ û şîdiyyayî got:

– Hûn usa bizanibin, ev kesê ser textebenda rûniştine prezîdent, serok, mîr, wezîrên dewletên mezînîn, yên ser pê serekwezîr, wezîrê karê derin û yên mayînin.

Pey vê dirindêzêra ew dest bi enenekirina pirsa rojê bikin. Û xwezila şevekê cîyê wan, nava herdu merzelada bê dayînê û ew hemû li vir, quntara vî çiyayî, nava hêwa paqışda, ber ava çemê ruhdayîda razêن, paldin. Ew kesana ji vir çûnê şûnda, wedekî dirêj ne merzel, ne mirin, ne ramânên dunyayê heyî, ne paldana wane li vira wê ji bîra wan neçe. Him rohêن wan wê geşbe, him jî hukumdarîya wane hişk wê nermin be!

Her tenê ew nava çiqas wedeyî da li merzelên gunde me maye, hêwa gundê me kişandîye, weke kîjan pîvandinê ruhê wî paqış bûye, wê ewqasî jî bi gewde-beden xwe hêmîn be!

Ji vir wêda min dengê xwe birî. Dest avîte berîya xwe destmala destâ derxist, pê xwîdana enîya xwe paqîş kir, çavên xwe li der-doran gerand. Çirîkek-dudu derbaz bûn, min herdu destêن xwe bilindî erşê ezmîn kir û kîlimîm:

– Şukur vê rojêra, min xwezilbûna xwe, xwestinêن xweye salan beyam kir. Hûn sax, ez jî silamet!

Vê weşê rojnamevanek ji nava qelfê mirovan derket, destekî xwe bilindkir û bi dengekî qube-qube got:

– Ez ji hemûya hîvî dikim, ji cîyê xwe nelivîn, ezê pisekê bidime Mûsa.

Bawer bikî hemû kesên li wir bi ecêb rûyê hev mîze-kirin û tu kesek ji cîyê xwe nelivitî.

Ew rojnamevan hat pêşberî min sekînî, destêن min kire nava herdu destêن xwe û got:

– Lo, bilindarê weke van cîyan, ezê pirsekê bidime tel

– Keremke, – Min, – got.

– Mûsayê, xwedanê karê nedîtî, nebinîyayî, diqewime ji nava wan deh prêzidêntên tu dibêjî, yek rabe, bêje:

– Ez ditirsim şev li vî merzelîda razêm, paldim? Tuyê çawa bersîva wî bidîf?

Min serê xwe bilindkir pêşiyê li mirovên wir civîyayî nihêrî, paşê vejerî ser milê xweyî rastê, êpêcekî cîya mîze kir û careke din berê xwe beşterbûyan:

– Birayê rojnamevan, gava te ew pirs da min tirê, janê laşê min hingavt, lê min ku, berê xwe da cîya, ew giş helîyan, te hew dizanibû bûne rûn, hingivê taşfîya min û ev nêtêن jêrîn dapalyane nava ruh, hiş, sewdayê min, naха guh bidine min, ez wana qalkim, hûn jî bibêhêن:

xwe  
kir,  
bûn,  
inên  
rket,  
ezê  
êze-  
min  
e te!  
vime  
Tuyê  
iyayî  
nêze  
janê  
gisik  
uin û  
naha

– Lê dema ew prezidênt ne ser tiştekî, ne ber tiştekî xwe menîya digire hukum dike, bi firindan, bi hêzên çekên nûhdem mirovên seqirî dide qirê, çima natirse? Paşê xwedêgiravî bona paşdemîya hetabîya gel, tewbûna welat, qure-qure bê jimar parêzkaran dora xwe, pey xwe dide rêzê, diçe cî-warê şêr, laşen mirovan, li cewa ku, têda xwîna bendan dikiş, mêze dike, çima natirse?

Vê gavê Kohêna rabû, çû destê werger girt, hatin pêşberî gişkan sekinîn û got:

– Mûsayê bira, te ci anî serzaran xweş bi xweş bû, nêt, mitalên kûrbûn bûn, lê bi dîtîna min xwestineke te, xuzulbûneke te maye. Ewê ji ez bêjim. Ew ji ewe, wekî te çend salan bîranîna kurapê min, ya bi navê “Mûsa hebin, şer tune bin” parastîye. Te xwestîye ew bigihîje cîyê cî. Te wê rojê ew da min: Him min, him Hans ew xwend. Ew ne ku, tenê bîranîne, ew dîroka şere, ew kevneşopîya gelê teye, ew bilindaya derbarê ewledê mîna te daye. Ezê ewê bidime weşandin. Bawerkin wê şûnda navê Mûsayê li dunê bê kişandinê.

Pey axavtina Kohêna min serê loda bîranînên xwe awa girt:

– Lo birano, lê xwîşkno, bîranîna min heta vira bû. Wê wêda ci wê bê gotinê, ci wê neyê gotinê, ci wê biqewime, ci wê neqewime, ewê Xwedê zane. Vira seleke kal-bavan kete bîra min:

– “Rastî neyê dunyayê, dunê şen nabe”.

**Mûsa.**  
**20.12.2016 – 27.05.2017**

cuda  
hêwi


kevir  
wekî  
Tosin  
henir  
dilek

xwea  
ya be  
Ferm

nehiy  
nehiy  
serka  
serke

qewn  
Qere

## Xwendevanên rêzdar!



*Ez vê pirtûka xwe bi dilgeşî  
rewayî birazîyê xwe-Tosinê Fer-  
man dikim!*

*Ne ku tenê bona wê yekê, wekî  
ew birazîyê mine; lê bona wê yekê  
ku, di nava nîyara mîrxasê roma-  
na “Xwezila” – Mûsa û Tosinê bê  
himber da mîna hevbûn heye!*

*Nîyara Mûsa ya efrandarîyê, ni-  
trandinêye, lê ya Tosin ya jîyana zindîye. Wekî bêjin hemû  
qenderên mirovan yên qenc di nava ruhê Tosinê Ferman da  
rorobarî ser hev bûne qe tu cewtiyê nakin. Nas-dostên wîye  
ku, di goveka aqara fireda henin, gişk dizanin Tosinê Fer-  
man di hemû alîyada merd, comerd, xêrxaz û kirane-  
gewreye.*

*Li vira nizam kê dapalande hişê min binivîsim:  
“Dunyayêda du bilindayî henin: Yek bilindaya Xwedêye,  
destê tu kesî nagihîjê; yek jî bilindaya mirovaye, ew jî na-  
be qismetê her kesî” Ew bilindaya mirovan bûye qismetê  
Tosinê camêr, lema pêşiyêne me gotine: – “Kesê hiş li sêrî,  
namîne piş dêrî”. Bila xwendevan rind bizanbe, wekî rastî  
jî di nava salên Şerê Wetenîyêyi Mezin da (1941-1945)  
gellek alman ji alîyê leşkerên Sovêtê da xerbend ketibûn û  
ji wana destek, dudu anîbûne nehiyên Azerbaycanêye*

*cuda-cuda, usa jî ew li nehîya Xanlarê-Goygola naha hêwirandibûn.*

*Ji karmendîya Tosinê Ferman çiqilek jî destçêxana kevir-serkêlk çêkirinye. Gellek, ji dûr û nêzîk dicedînin, wekî kevir-serkêlka bîrdarêن ezzîzên wan li destçêxana Tosinê Ferman da bê dabîrkirin. Du sedemê vê yekêye heq henin. Yek comertîya Tosinê maqûle, yek jî her serkêlek bi dilekî, bi daxwezekê tê çêkirinê.*

*Pêwîste ewê jî bînine serzaran, wekî Tosinê Ferman xwedanê xwendina bilinde. Ewî Ûnîvîrsîtêta Pêdagojîyê ya besa rîyazîyatê bi hêjayêن bilindva xitim kirîye. Tosinê Ferman xwedanê mal, malbetekê sîyanete!*

*Ji sala 1989-î Tosinê Ferman sehetî li almanên nehîyê dikir, merzelên wan jî diparast. Almanê xerbendî li nehîya Xanlarê, yê dawîyê dunya xwe guhastine, bi serkarîya Tosinê Ferman ew him hate binaxkirinê, him jî serkêlka wî hate danînê!*

*Xwezila jîyanêda Mûsa-Tosin hebin, şer-dew tunebin.*

*Tosinê Ferman jîyanêda bûye piştovanê xwîşk-biran, qewm-pismaman, gellek koçberên zorê, yên Qewmandinê Qerebaxa Çîya, destêن wan gîhandîye sêla nanê germ.*

**Ahmedê Hepo,**

*Endamê Yektîya Nivîskarêن Azerbaycanê*



Bŷer

W

bi nav  
baycan  
da çar  
Moskv  
Vaşîng  
gerîdol  
ku li v  
navnîş  
mîlyon  
ber ku,  
Dema

—

malêñ  
nin. Mi  
la 194  
dirêje,  
vira jî  
bigerî,



*Kunbeza helbestvanê Azebaycanêyî dunêeyan  
Nîzamî Gencevî*

## **Ermenî li ku bobelata xwe derz dikin?**

Wedê salên Yektîya Sovêt ji Vaşîngtonê mîlyonêrekî bi navê Con birîyar kir ku, havîna sala tê here li Azerbaycanê bigere. Wede hat gihîşt, ewî çi evraq pêwîstibûn da çareserkirinê û rojekê havînê firindê sîyar bû, hate Moskvayê, ji wir jî hate Bakûyê. Berî hatina xwe li Vaşîngtonê ermenîkî şêwir da bû wî, wekî li Bakûyê gerîdok, welgervan wîra pêwîst bûnê bila rastî Armaîsê, ku li wir dijî bê, ewê wira çi pêwîstbe bike. Wî ermenî navnîşana mala Armaîs, him jî cîyê karkirina wî da mîlyonêr Con! Ewî qe dijwarî nekişand rastî Armaîs hat, ji ber ku, ew wezîrîya xwendinê ya Azerbaycanêda kar dikir. Dema rast hatina ewlîn Con jî Armaîs pirsî:

- Tu înglîsî ji ku hinbûyî.
- Ez ermenîyê Sûrîyayême. Malbeta me û hinek malên ermenîya gundekî kurdanda dima. Ez bi kurdî jî zanîn. Min heta dersxana duda li wir bi îngîlîsî xwendîye, sala 1947-a em hatine Ermenîstanâ Sovêt. Serbuhurstîya min dirêje, rojekê eze seranser derbarê xweda wera bêjim. Li vira jî Armaîs, şêwir da Con wekî li Azerbaycanê cîyê lêbigerî, hêmîn bibî, ew navbera Gencê Goygol, Maralgol,

bintara Çîyayê Kepezêye, yek jî Qerebaxa Çîya, bajarê Stêpanakêrtêye.

Milyonê li Bakûyê jî dijwarî nekişand, evraq dane rastkirinê, wekî 15 rojan Armaîs wîra gerîdokê, him jî çawa wergerê zimanê rûsî, azerbaycanî û ermenîkî bike. Wî bibe navbera bajarê Gencê û Qerebaxa Çîya.

Pêşiyê ew hatine Gencê, çûne ser mexberê helbestvanê dunê eyan Bi wê kirina xwe Armaîs çav ser xwera dida derbazkirinê. Paşê hatine nehîya Xanlarê, li wir sê roja wan. Armaîs li Xanlarê ew ermenî nema Conra nekire nas, li malên wan negerand.

Sê rojan şûnda Armaîs ew bir derxiste Goygolê, Maralgolê. Con ser didema xwezaya van dera heyrhejmekar ma û carekê, duda gote Armaîs:

– Min tu welatî dewlemendîya xwezayêye awa nedîtiye, ermenî jî, li vira ji Azerbaycanîya rind dijîn.

Armaîs jî wîra got:

– Ê, ev çîye, hela em herine Qerebaxa Çîya binihêre dunêda ci heye, ci tune?

Ewana roja caran ji Gencê derketin û berê xwe dane Qerebaxa Çîya. Rêda Con derbarê her gundekî, şûnwarekî, derheqa navendênehîya pirs dida Armaîs, ewî jî, weke dilê xweyî xilt bersîva wî dida. Gava ewana hatin gîhîştine bintara bajerekî, ji newalekê derketine wergerekî vî alî rê jî, wî alî rê jî darêñ bînxweş serî dabûne serê hev Con pirsî:

– Ev der kuye?

- najarê Armaîs bi kulzikî bersîvda:  
 – Eva Axdamê.
- dane – Min navê Axdamê bihîstîye, vira dibêñ xwerekêñ  
 jî çâ- tem-lem, him jî kibaba dipêjin. Wekî pêşîyê xwerînxane  
 e. Wî hebe em li wir bisekînin nîn buxun.
- lbest- Armaîs tenê gilîk anî ser zimanê pijik:  
 twera – Na!
- sê ro- Avtoajoyê wan Azerbaycanî bû, ewî bi îngîlîs got:  
 lekire – Armaîs, tu çima mîvîn dixapin, li pêşîyê kibabx-  
 aneke nebînyayî heye, navê wê “Mala kibaba”ye. Ezê wir  
 maşinê xweyîkim!
- golê, Con ji axavtina avtoajo şabû, lê Armaîs te hew di-  
 heyr- zanibû merê res lêdaye. Him jî tîrsîya, ewî nava çar rojada  
 awa gellek qeletî kiribû.
- ihêre Çend mîtra şûnda avtoajo li alîyê rastê, li bilindcikî,  
 dane ber “Mala kibaba” xayîkir. Avtoajo zû peya bû, derîyê  
 urekî, avtoyê ser mîvîn vekir û wîra got:  
 weke – Biborîne bide pey min em dera hanê, dora wê  
 ştine pêşxwînê rûnên!
- alî rê Con û Armaîs cîyê kivşkirî rûniştin, lê avtoajo çû bal  
 Con kibab petî, ci got, ci ne got, ew zane.
- Wana li wir nan xwerînê şûnda, rêketin. Rêva Con  
 berê xwe da Armaîs:  
 – Tu yanê van dera rind nasnakî, yanê jî nêta teye  
 mayîn çibûye, nizanim?
- Armayîs bi kulzikî bersîvda:  
 – Min dixwest me bintara Stêpanakêrtê nan bûxwera.

Con careke din kêlimî:

– Ez gellek welata qesidime, min tu derê kibabêñ awa ne dîtîye, ne xwerfye. Azerbaycan welitekî hewaskar û dewlemende.

Wana rêya xwe domandin, nişkêva li fêza gundekî Con gote avtoajo, wekî maşinê xweyîke. Ew ji maşinê peya bûnê pirsî:

– Ez dinihêrim rêya hesin tê kişandinê, ew ci rêtê, serê van çîya?

Vê carê avtoajo bersîvda:

– Maqûl Con, ev rêya hesin wê heta Stêpanakêrtê bê kişandinê. Hindik maye kişandina rê rêtê xilazbe. Ev rê beqî katibê Kompartîya Azerbaycanêyi Yekemîn tê kişandinê.

– Hêyder Elîyêv, – Con got, – sîyasetekî kûr, him jî zehmetê giran hiz dike!

Wê wêda hetanî bajarê Stêpanakêrtê tu kesî gilîk ne anî serzaran.

Wedê hevrazê dawîyê derbaz bûn Con bi qestbende pirsî:

– Gelo, di, demên hênda navê vî bajarî ci bûye?

Armayîs xwe kerî avît, deng jê derneket. Con dîsa vegerî ser avtoajo:

– Tê kivşê Armayîs naxweze bêje, tu keremke.

– Ber navê vî bajarî Xankendî bûye.

Awa bi awa, Con çend roja li wê navberîyê gerîya û bi bîranînêñ qenc, dîtînêñ nedît dît vegerî Vaşîngtonê.

awa Sal hatin derbaz bûn, damirazandina Sovêtê ber derm-  
 ar û daxê bû, ermenîyên Ermenîstanê, yên Qerebaxa Çiya, yên  
 dekî ku, li aqara Azerbaycanêye cuda-cuda dijîn, ser têklîyên  
 şinê sala rabûn û beqî piştovanê xwe pirsa Qerebaxê derxis-  
 tine holê.

eyê, Meremê me ne ewe, ser hemû kirinêr ermenîyaye qî-  
 lê bisekin, lê ewê bêjin, ermenîya 20 % axa Azerbaycanê  
 bê dagirkirin û wana tirê idî ewana Qerebax standine, tevî  
 v rê Ermenîstanê kirine. Lê sed car lê, wana nizan bû ewana  
 tê serser ketine nava bobelatê. Wê bobelatê çawa minak  
 jîyana rojê Armaîs, yên pey dagirkirina Qerebaxa Çiyara  
 derxine holê.

n jî Wê demê Armaîs bi şabûn rabû kar-xebata xwe hîş,  
 ne çû Qerebaxa Çiya-Xankendê. Çend salên pêşin du-sê er-  
 nde menî, usa jî Armaîs, beravî cîkî bûnê, hevra digotinê emê  
 iisa nava du salada pirr-pirr pêşta herin, ewê bibine  
 dewlemend.

Roj dibûne meh, meh dibûne sal rewşa Armaîs û usa  
 jî ya bi hezarê din reş-heş dibû.

Armaîs nihêrî awa here ewê maleta xwe vira birçî-ti,  
 a û nava sur-sermêda ji dest bide.

Şevekê, dema nava cîyê sarda kêlek-kêlek weldigerî,  
 xwe-xwera got: "Ermenîyên me, him yên vira, him yên  
 Ermenîstanê bin destava direvine welatên dereke. Ne dostê  
 min li Vaşîngtonê-Con heye. Ya qenc ewe çawa dibe bila  
 bibe, diravê rêya xweye vî serîda çareser bikim herime bal

dostê xwe. Wêda hatine jî ewê diravê rêya min bide. Bila ew alîkarîyê bide min, destê zarên xwe, nevîyê xwe bigirim herime çem wî”.

Ewî rojekê mîna seyê avî, çû Îrevanê, Moskvayê, ji wir jî firî Vaşîngtonê. Bi nemir, nejîyan hate derê Con. Con bi mirûz ew bire xanîyê xweyî kewnî berê û got:

– Armaîs, tu çawa û çîma hatî derketî vira?

– Conê bira, – Armaîs di rewşa parsekada, – got, – ez mirime min ji erdê hilde, me ermenîya digot Qerebaxa Çîya cinnete, emê bibine dewlemendê dunyayê. Conbihêrs got:

– We ermenîya beqî Azerbaycanîya, beqî dewlemendîya Azerbaycanê ew pêştaçûyîna min dîtî, destanîbûn.

– Erê bira, rêda mesele-şîretekî gelê kurd kete bira min, destûrê bide wêya tera qalkim.

– Qalke, qalke, Armaîs.

– Lo bira, – Armaîs bi rûvîtî, – dest bi bûyere kir. Go du dostê heve zargotîyê hebûn. Ew hatibûn gihîstbûne 70-80-ê salî yekî wana dunya xwe duguhêze. Yê din wedekî nayê serîkî zarên dostê xwe naxe.

Zivistanbûye. Li sûkê ew mîrik rastî kurê dostê xwe tê. Pey selam-kilavêra ew dipirse:

– Birazîya, ez zûva nehatime mal we.

Min dixwest bizanibûya pey mirina dostê minra, hûn ewledê wî pêşta çûne, yanê paşa?

- Bila  
bigi-
- yê, ji  
Con.
- ez  
baxa  
Con
- beqî  
dîtî,
- bira
- r. Go  
e 70-  
edekî
- xwe
- hûn
- Na apo, – xort bersîvê dide, – pey mirina bavora, em êpêcekî pêşta çûne.
  - Mêrik şadibe û dibê:
    - Şikir, naha berf êpêcekî lê kirîye, hema hinekî berf helîya ezê bêm serîkî wexim.
